

Kovareke  
Rewşenbîrî  
Serbixwe ye

Hejimar:36  
Havîn:2006

[www.kovara.pirs@yahoo.com](http://www.kovara.pirs@yahoo.com)

Bihha:50 p.s

Pêşgotin -----	2
Kurdên Sûriyê -----Dr.M Zeyno	3
Nivîskar û xwendevan -----Dr.Rozad Elî	11
Rewşenbîr û pêdiviyên-----Zamdarê Zindî	14
Yilmaz gunêh -----K.Henan	18
Pirsên malpera rojava----- Pirs	20
Nameyek ji pirsê re----Samî Ehmedê Namî	22
Navên çiya yên Kurdistanê-Dilbend Xlîl	31
Qelewbûn-----Dr.M.Elî	32
Windowsa Kurdî êcar ne xewne..Entrnêtê	34

### Li ser kelepûr

Ji gulîstana ramanan---- Merwan Berekat	35
Stranbêjê kurd û ziman-----Pertewê Şerqî	38

### Çêrok

Roviyên Çûçik û Pilingek---Mistefa Henan	39
--	----

### Helbest

Xewsê welêt -----Tegezarê Marîmî	41
Pûtên hişyar-----Ciwana Abdal	43
Azadiya min----- George Moutak	43
Ji kûpê Kurd -----Mihemed Maxot	44
Zengilê har ----- -Oflaz	45
Ta kengê -----Remzî Mele Marif	46
Binefşên tariyê ----- pirs	47
Banga hêvîtiyê -----	48

## **Bang ji nivîskarên Kurd re**

**Me** di pêşgotina hejmara 35 an de soz dabû, ku emê kar bikin ku, wê bi şêweyekî baş û di demê de biderxin. Lê mixabin, wek Kurd dibêjin “ba li bêderê nehat”, sozê me bi cih nehat û “Pirsa” me dîsa kulek bû, çî ji hêla demê ve û çî ji aliyê naverokê ve. Em ji ber wê rewşê ve xwe perpirsyar û gelek xemgîn dibînin. Emê êşkere ji xwendevanên xwe re bêjin, ku “destek bi tenê nade çepkan”, em jî bi destekî dixebitin. Ji bilî girêkên çapê yê herdem riya me teng dikin, gelek tiştên din jî hene me xemgîn dikin, her car li ber radiwestin lê mixabin çarê jê re nebînin; di serî de, hebûna berhem û nivîsarên baş in. Ji ber ku wek tê xwastin em alikariya nivîskarên Kurd nabînin.

Em ji we venaşêrin, nivîskarên ku me berê xwe dabûnê û em bi hêvî bûn berheman ji me re bişînin, ne li ser sozên xwe bûn, û stubariyên xwe bi perpirsyarî hilnegirtin, ne tenê wilo, wan em êşandin û birîn kirin. Emê tenê du nimûnan bêjin:

Gava me ji nivîskarekî xwest alikariya me weke kovar bike, bi kêrç bersiv de û got: **“Win hîn wî benîştî dicûn?!”. We hîn dev jê bernedaye!?**

Nivîskarekî din jî, gava me ew dilxwazî li ber danî, got. Ev kovar ne jî hêla hevalê filan kesî û filan partî de piştgir e!? Li min biborin, ez ji kovara we re ne amade me!!

Ev du nimûne ne ji “nivîskar û rewşenbîrên” Kurd in, ewên ku bi Kurdî dinivîsin, xwe Kurdperwer dibînin û kanin bi çîwalan rexnan li hemî kesan bikin.

Birastî, ev ton helwestên neynî yê ku ji hin nivîskarên me dertên, cihê mixabiniyeke zor giran in, û hîç netên qebûl kirin.

Ji hineka ye, ku gava em xwe diwestînin û berpirsariya karekî wilo bi westan dikin, sûdeke kesî tê de heye, filan partî yan bêvan kes sûdê jê werdigre. Ji ber wê jî xwe giran dikin û helwestên wilo çewt û tûj digirin. Lê em tev dizanin ku rastî ne wilo ye, eger sûdek û karek hebe, ew tevahî ye û jî ziman û çanda me Kurdan re ye. Mîrov carina mat dimîne; **“Pirs”** kovareke Kurdî ye, rewşenbîrî ye, nêzik siyasetê nabe, win jî bi Kurdî û ji Kurdan re dinivîsin, dixwazin berhem û baweriyên xwe bigihînin gelê xwe, win çima ewqas teng diramin û bi rik û kudûret dijîn?.

Ne şerme di nav sê milyon Kurd de li Sûriyê kovarek bi zimanê Kurdî dernekeve. Gava biyaniyek li weşanên Kurdî bipirse, emê çî bêjin? Emê çî bersivê bidinê? Ma emê kanibin bêjin ku em nivîskarên zimanê Kurdî ne? Gereke em hesabê dîrokê bikin. Bêguman ewê ji neviyên me re bêje: Erê gelê Kurd hatiye zulmandin, lê ne sûcê min e, bav û kalên we rê ji we re venekirin, ew qels bûn, ev berpirsariya we ye, gazinan ji dîrokê mekin.

Dîsa em bang li nivîskarên xwe yê hêja dikin, bila em dev tiştên hûrmûr berdin, bi bepirsareke bilind û bi helwesteke erênî li weşanên Kurdî li Sûriyê binêrin û alîkariya wan bikin. Ji ber ku em baş dizanin, zimanê Kurdî ne bes yê partîfî û kasan e, ew yê gel e, stubariya me hemiyan e ku em lê xwedî derkevin, berketiyê wî bin, pêş ve bidin û ji wî û gelê xwe re dilsoz bin.

**Desteya birêvebir**

## Kurdên Suriyê

### di “dîroka Kurdîstanê” de

Wergêr ji Russî: **Dr.M.Zeyno**

**P**irtûkek bi navê “Dîroka Kurdîstanê” bi zimanê Russî ji aliyê “Navenda lêkolînên Kurdî li bajarê Mosko” di sala 1999 –an de bi derket, ew di bin çavdêriya du pirofêsorên navdar de, birêz: M.S.Lazarêv û Ş. X.Mehoî derçûye, her wiha nivîserên wê jî: M.S.Lazarêv, Ş.X.Mehoî, Ê.Î.Vasîlyêva, M.A.Hasretiyân, û O.Î. Jîgalîna bi ferehî û bi zanistî rewşa Kurd û Kurdîstanê şirove kirine. Pirtûk 519 rûpel in û bi çapek ciwan derketiye.

Pirtûk cara yekê ye, wek di pêşgotina wê de hatiye, dîroka Kurdîstanê, ji destpêka ketina dagîrkerên Erebbî ya Kurdîstanê ta bi rojên îro, dide ber roniyê. Pirtûk li ser bingeha çavkaniyên ku berê eşkerene û yên ku cara yekê ye tînin nivîsandin hatiye nivîsandin, wek di navên nivîserên wê re xuya dibe, Kurdenasîna li welatê Rusiya bi hewldana wan birêzan, hîn jî berdewame, ew, tevî hilweşandina Sovyêtîstanê, hîn jî karê xwe berdewam dikin, hêjayî gotinê ye ez bêjim ku navenda lêkolînên Kurdî li Moskou hin pirtûkên din jî li ser Kurd û Kurdîstanê bi derxistin, wek nimûne:

- Kurdîstanê serdem, 144 rûpel, bi zimanê Russî, karekî bi hev re ye, Moskou 1995.

- Kurdîstanê bakur îro, (dersên bihranê)108 rûpel, Moskou 1997.

- Dîrok û pêkenokên Kurdî, wergêr :Z.A.Yosupova, 136, rûpel, Moskou 1996.

Her wiha gelek pirtûk hatine nivîsandin li ser zaravên zimanê Kurdî, mîna “Zazakî” wek pirtûka Î.A.Simîrnova û K.P.Eyobî, li bajarê Moskou, 1998, û “Goranî” mîna pirtûka Z.A.Yosopova, 1998, li Sankt Pêtirsburgê. Lê pir mixabin me nûçeyek gelek ne baş wergirt ku navenda lêkolînên Kurdî li bajarê Moskou ya ku bi rêz pirofessor Şakiro.X.Mehoî serkêşiya wê dikir ji ber sedemên diravî “aborî” hate girtin, û careke din jî Kurd ji kaniyeke girîng ya zanistiyê bê par man.

“Dîroka Kurdîstanê” ji sê beşan hatiye dabeşkirin, beşê yekê; derketina ser qada dîrokê, beşê duyê; şiyarbûna netewî, û beşê sisyê; dîroka nû, her wiha ew ji heşt biran hatiye nivîsandin, di beşê sisyê, di birê pêncan , di rûpelên 292-295 an di bin navê “Kurd li

Sûriyê”de û di birê heftan di rûpelên 419-424 an ,di bin navê “pirsa Kurdî li Sûriyê”de nivîserên pirtûke li ser Kurdên li Sûriyê rawestîne ye.

Em di wê heviyê de ne ku di demeke nezîk de hin zanyarên Kurdan kanibin wê wergerînin zimanê Kurdî.

## Kurd li Suriyê

Piştî ku agirê cenga cîhanê ya yekê hate vemirandin, beşek ji axa Kurdistan bû para Sûriyê ya ku di bin mandeta Fransa de bû, Kurd 10% ji rûnştavanên Sûriyê ne. Bi vî rengî, ew ji kêmetewên wê dewletê koma pêşin in . Ew bi giranî, li heremên bakurî welêt, li Cizîrê, Cebel-Elekrad û Eyn-ElEreb rûniştîne. Her wiha, komên gelê Kurd yê gelek mezin, li bajarên Heleb, Hims û Şamê bi cîh bûne.

**B**extê Kurdên Sûriyê dirametîk e, ji nû ve parvekirina Kurdîstanê bê ku berjewndiyên civakî û aborî yên Kurdan bidin ber çavan, kişandina xêzên sînor zehmetiyên jiyana netewçandî û aborî ya gelê Kurd pirtir kir. Di ancama diristkirina sînoran, di navbera Turk û Suriyê de, beşekî gewre ji Kurdan ji yek eşîr û ji yek malbatê li herdu aliyên sînor parvebûn. Berxwedana gelê Kurd ji bo parastina têkliyên netewî, civakî û aborî rastî serpêhatiyên renga-reng

yên şer û siyasî ji aliyê dagirkerên Kurdîstanê ve hatin.

## JI BER SERKETINA

di şerê netewî de, kemalîstan ji bilî daxwezên wan li başûrî Kurdîstanê, çavên xwe berdan bakurî Sûriyê, herêma Turkan eşkere diyar kirin ku sînorên wan yên başûr bi xeta hêsin ya kevin , ya ku kemalîstan di salên 1922-1924 de bi dest xistibûn re, dirêj dibe. Her wiha piştî ku, Turkan şoreşa Kurdan 1925-an li Turkiyê hilweşand, çavsoriya wan di axa Sûriyê de zêdetir bû. Bi vê helwesta xwe ,Turkiyê dixwest beşekî ji axa Kurdan bi dest xwe xîne û di hemî deman de, rê li ber raperînên tevgera azadîxwez ya Kurdan, li ser axa Sûriyê ya di bin Mandatê de bû bigire. Di sala 1929-an de, pirsgerêka bi Fransa re, li ser sînorên Turk û Sûriyê hatibû çareserkin, li gora wê çareseriyê tayekî zirav ji axa Kurdan bi para Sûriyê ket.

Li Sûriya di bin mandatê de, jiyana Kurdan, bi gelemperî, wek ya birayên wan li beşên Kurdîstanê yên din bû. Lê, li vir û li dijî Kurdan, bi giştî, , wek li Turkiyê, Îran û Îrakê ew serpêhatiyên hişk û tund ne dihatin bi karanîn. Li Sûriyê, di bin mercên taybet de, rê li ber pêşxistina jiyana netew-çandî ya Kurdan hatibû vekirin û Kurdeperwerê herî navdar Celadet Bedirxan roleke mezin ,di wê de lîst, di siyaseta Kurdî ya Fransa de mirov dikare pîvana ku Îngeltera di siyaseta xwe ya Kurdî de li Îrakê bi kar dihanî bibîne. Fransa, hebûna pirsgirêka Kurdî li Suriyê ,weke faktorê rawestandina helwesta netewperestên Erebi li dijî Fransa didît.

Nasnekirina netewperestên Ereban mafên netewî ji bo Kurdan , helwesta Kurdan ji bo wan mafan kir ku, Fransa li ser wê nakokiyê bi germî bilîze, ta ku bandora xwe, li ser herdu aliyan kûrtir bike û di hemî deman de, wê bandorê biparêze. Lê tevî wê jî, hêzên netewî û dêmokratîk yên gelê Kurd, bi giranî xwe di qada şerê li dijî Fransa de diyar dikirin. Kurdan bi xeşîmî,bi sozên netewperestên Ereban bawerkirin ku, piştî derxistina kolonyalîstan ji welêt, ewê mafê netewî yê Kurdan

pêkbînin. Di serhildana ku Sultan Başa Eletreş serkêşiya wê dikir, refên şervanên Kurdan ,di bin rêvebiriya Ehmed axa Baravî, Mihemed Şerîf ElKurdî û Mihyedîn Kara axa bi,wan bi xortanî xwe li dijî leşkerên Fransa nîşan dan. Her wiha Kurd bibûn hevalbendên çalakvan,yên xwenîşandan û piroteskirina mandeta Fransa li bajarên Şam, Heleb û Heseça û h.d.

Di sala 1937-an de ,li herêma Elcezîrê, li bajarê Tobsê nûnerên Kurdan û yên kêmnetewên din li dijî serpêhatiyên qirêj yên karbidestên fermanariyê li wê herêmê rabûn. Wan xwestin Fransa bike ku, karbidest bi kesên herêmê bide pejirandin.

Xwenîşandan û çalakiyên piroteskirinê yên ku di 5 hizêrana 1937-an de ,li bajarê Heseça dest pê kiribûn, bi lez giha bajarê Qamişlo, Ras-Eleyn, Ayn Dîwar, Derbesiyê û bakurî herêma Elcezîrê. Kurdan komîtak, ji bo karê tevgera pirotestkirinê ya ku di bin rêvebiriya Kurdekî bi navê Tahêr Elmardînî de bû, saz kir. Li30 Tebaxê 1937 an ,wê komîtê daxweza xwe ji hikumatê re eşkere kir, ku ew divê parêzerê herêma Elcezîrê, ji kesên wê ve bipejirandîbe û mafê pejirandina karbidestên fermanariya Elcezîrê bide rûniştevanên

herêmê. Lê pir mixabin ,ev soz tev man soz û pêk nehatin.

Di sala 1939-an de, li herêma Cebel-El-Ekrad raperînek Kurdan ,di bin rêvebirya Şêx Îbrahîm de serî hilda, cotkar bibûn hêza bingehîn ya serhildanê, ya ku di hemi deman de, li dijî axan bû. Ji bo binpêlkirina serhildanê, hêzên Fransa yên leşkerî hatin alîkariya leşkerên Sûriyê, tohildan ji Kurdan gelek bi hêz bû, xişm û bêtarek giran bi ser gund û navça Efrînê de hat. Gelek gund vala bûn û pir ji Kurdan ber bi Turkiyê ve reviyên.

Bi vî rengî xuya dibe ku, di navbera herdu cengên cîhanê de, pergala Kurdên Sûriyê ne dûrî rewşa birayên wan li Turkiyê, Îran û Îrakê ye û ji ber sedemên objektîvî , wek ya tevgera Kurdan li beşên Kurdîstanê yên din tevgera Kurdan li Sûriyê negiha wê ferehî û kûrbûnê. Lê tevî wê jî, wê xwe her dem nîşan dida û bibû faktorekî mezin, ku di rewş û pergala welêt de cih digirt.

## **Pirsa Kurdî li Sûriyê**

*di salên 50-80-î de*

**T**evî ku hêzên netew-dîmokrat ,yên Kurd bi xortanî ,di tevgera li dijî împeryalîzmê de ,li Sûriyê

cih digirt Roleke berçav, di rizgariya wê de lîsti bû. Rewşa wan ,ber bi başiyê ve nebû. Belê, bervajî wê bû. Newekheviya netewî, nema wek berê, ew hîn xirabtir bû. Eger di dema mandatê de, hin kanînen biçûk ji bo berdawamiya jiyana çandî-netewî ya Kurdan hebûn, bi hatina netewperestên Ereb ser têxt ,ew kanîn jî ji dest çûn, siyaseta li dijî tevgera netewî ya Kurd, karakterekî taybet wergirt, newkheviya netewî-siyasî û zehmetiyên aborî bi giranî zora xwe dan ser jiyana gelê Kurd. Ji encama nebûna dibîstanên dewletê 90% ji gelê Kurd nexwende ma, banga û daxwaza Kurdan li hikumata Sûriyê, ji bo vekerina dibîstanan ,bê bersîv ma. Ji ber kêmxwerinê, nebûna bijîşk û dermanan, gel bû qurbana nexweşiyên giran. Pirsra çandinê bi giranî siya xwe dabû rewşê, li gor statîstîka fermî sala 1949 an, nêzî 60% ji axa çandinê li Cezîrê û 90% li Cebel El-Ekrad bi dest hejmarek pir kêm ji xwediyên erdan de bû. Her wiha rewşa siyasî ,li welêt bê aramî bû, ji sala 1949-1951 an çar înkîlabên leşkerî li Sûriyê pêkhatin, wan serpêhatiyan kirin ku, têkliyên bi Kurdan re tûj û tund bibin. Wiha di dema femandariya Husnî El-Ze'îm de, bi netewa xwe Kurd re, çend ji Kurdan wek serok wezîr Muhsên

El-Berazî, berpirsiyarê li welêt femandariyê bûn, wan rewşa Kurdan ber bi başiyê ve nedan. Lê, ew bibûn sedema piropogenda li dijî Kurdan.

Piştî hilweşandina dîktatora Edîb Şîşeklî sala 1951an, li welêt rêjîma dîmokratî bi ser ket . Li dawiya salên 50, mirov dikare hinek liv û lebatên tevgera Kurdî ya netew-dîmokratî bide ber çavan. Di wan deman de (bi taybetî li nîvê diduyan 1957 an) biveya cenga Turkiyê li dijî Sûriyê bilindtir bû, di çalakiyên gel de bo paşvedana biveya Enqerê, Kurdan beşekî mezin ji xebatê hilada ser milên xwe.

14 Hizêrana 1957 an, partiya dîmokrata Kurd li Sûriyê hate dameziran din, di programa wê de eşkere hatibû nîşandan ,ku girêdanek di navbera xebata ji bo mafên gelê Kurd û sazkirina desthilatdariya dîmokratî di welêt de heye. Partiyê daxwez dikir ku , mafên gelê Kurd yê netewî ,di destûra welêt de bête nîşandan, bi aramî 'urf û adat û çanda netewî ya Kurdan bêtin parastin. Her wiha, li pêş xebata Kurdan di saziyên hikumatê û civakê de jî rêvekin.

Piştî ku li sibata 1958 an Suriya û Misir, bi navê Komara Ereba Yekboyî bûn yek dewlet; serokên Kurdan bi serokatiya

komarê re gihêştin erêkirinekê, ku gelê Kurd dikane pirtûk û kovaran bi zimanê dayîkê biweşîne û vekirina dibîstanên Kurdî li wan herêmên ku gelê Kurd tê de pirhijmar e. Her wiha ji meha Temûzê 1958 an de, weşana radyo bi zimanê Kurdî ya ku li seranserê Kurdîstanê dihate guhdarkirin ,dest bi karê xwe kir.

Kurdên Sûriyê, bi dilekî mişt ji şahiyê, nûçeya şoreşa 14 Temûzê 1958 an li Îrakê wergirtin, şanda hêzên Kurdî yê dîmokratî bi taybetî ya xortan, bi dengê bilind diyar kir, ku ew bi her awayî piştgiriya siyaseta şoreşê dikin, ya ku roleke mezin dabû wekheviya Ereba û Kurdan. Lê nakokiya ku di navbera KEY û Îrakê de li ser serkêşiya xebatê di rojhilatê Erebiyan de derket qada siyaseta, têkliyên Qahîra û Bexdayê daketin pêvajoyeke gelek nizim. Ev tev, bi taybetî derketina Sûriyê ji KEY, serast bandora xwe da ser rewşa Kurdên Suriyê. Di îlona 1961 de, şerê çekdarî, ji bo otonomiyê, li Kurdîstana Îrakê dest pê kir. Wî serî kir ku Şam siyaseta xwe bi tûjî li ser Kurdan bi gihure. Hikumata Suriyê, ta ku liv û lebata tevgera Kurdî li welêt rawestîne ,her tiştê ku ji destê wê tê kir. Xwepêşandan û civînên Kurdan hatin qedexekirin, gelek

Kurd hatin girtin û ew avêtin binê zîndanên . Rê li ber axaftina bi zimanê Kurdî hate girtin, li ser sînorên bi Îrakê re çavdêriya dewletê xortir bû .Her wiha ,ta ku nûçe û aghdariyên serpêhatiyên şoreşa Kurdîstana Îrakê derbazî sînorên Sûriyê nebin.,çi ji destê dewletê dihat kir.

Di (November) 1962 an de, hikumatê, li ser bingeha ( mersum) Nr 93, 23 tebaxa 1962 an, hîlbijartinek taybet li parêzgeha Cizîrê organîze kir. Di encamê de ,120 hezar Kurd hêdî nema bi welatiyên dewleta Sûriye bin û ji mafên xwe yê wetalî bê par man. Kurdên bê nifus ji gundan dan ber koçkirinê . Ereb anîn şûna wan, sîstema bi navê “kembera Erebî” ji bo Ereban avakirin, sîstema apartaydê tîne bîra mirovan.

Di avdara 1963 an de, piştî mehekê ji înkîlaba hikumatê li Îrakê, serpêhatiyên wisa li Sûriyê jî pêk hatin. Be'sên Sûriyên hatin ser têxt, yê ku 17 Nîsanê diyar kirin ku ,ew dixwezî Misir, Îrak û Suriyê bikin yek dewlet. siyaseta li dijî Kurdan, ya serok wezîr Selah Bîtar, karekterekî hişk û bê kompiromîs girt. Li piştî jî nû ve destpêkirina şerê çekdarî li Kurdîstana Îrakê, di hizêrana 1963 an de, şanda hikumata Îrakê bi serokatiya

cîgirê serok wezîr Elî Se'dî giha Şamê ji bo şirovekirina xebateke hevbeş li dijî Kurdan, hikumata Sûriyê civînek bi hin serokên Kurdan li Sûriyê re dirist kir ,“tevgera di bin serokatiya Barzanî de gengeşe kirin” û wan diyarkirin ku “*hêdî em bûne Ereb û emê welatê xwe Sûriyê biparêzin*”.

Di dema serpêhatiyên dirametîk û navdar di havîna 1963-an de, dema rijîma Bexdayê êrişeke berfireh ajot ser gelê Kurd, hikumata Sûriyê biryar girt, wek hatiye bibîranîn, piştgiriya Baxdayê bike . Di oktobra 1963 an de, liqek leşkerên Sûrî û komek ji pîlotan ta ku li dijî Kurdan şer bikin şande Kurdîstana Îrakê. Hikumata Sûriyê ne tenê bi tundî li dijî tevgera Kurdî li Sûriyê, her wiha ew li dijî her awayî çareserkirina pîrsa Kurdî li Îrakê jî dixebitî. Gelek balkêşe, di vir de daxuyana hikumata Sûriyê, li ser lihevkerina 29 hizêrana 1966-an ,di navbera serokatiya Partiya dîmoqrat a Kurdîstanê û hikumata Ebdulrehman El-Bezaz de, ji bo çareserkirina pîrsa Kurdî, di wê de, Şam li dijî her rengî hevdîtinên aşitiyane bi Kurdên otonomîst re rawestî, yê wek “ajanên împeryalîzmê” hatibûn bi nav kirin.



Hêzên netewî yên Kurdên Sûriyê bi bahwerî eşkere dikirin ku, xebata ji bo pêkanîna mafên netewî li vî welatî gereke tenê bi riyên aşitiyane bin. Lê hikûmatê, bervajî Kurdan, aliyê qewetê girt.

Di destpêkê de ,rola sereke ,di tevgera netewî ya Kurdên Suriyê de ,parta dîmoqrat a Kurd li Suriyê dilîst. Lê dîtinên rengareng , ku rijîmê her dem germ dikirin, encam dan û zirarek mezin gihand tevgerê.

Perçebûna partiya dîmoqrat a Kurdîstana (Îrak) di 1964-an de, bi lez bandora xwe giha parta dîmoqrat a Kurd (Sûriya), partî bû du qet. Di sala 1965-an de, ji bilî partiya dîmoqrat a Kurd li Sûriyê “Elpartî”, du partiyên din jî dixebitîn: Partiya dîmoqrat a pêşverû ya Kurd li Sûriyê û partiya dîmoqrat a çep a Kurd li Sûriyê (ya dawî di sala 1980 de navê xwe guhart û bû partiya hevgirtina gelê Kurd li Sûriyê PHGKS). Her wiha, di salên paş

de ,hin partiyê Kurd yên nû û bi çûk derketin meydanê.

Bi hatina Hafêz El-Esed ser têxt,li dawîya salên 60-destpêka salên 70, hin guhartnên ber çav di siyaseta hukumatê de ji bo Kurdan dihatin dîtin, her hikumatê pirs a Kurdî li welêt nas nedikir. Lê ew hişkiya li dijî Kurdan hinekî sivik bû. Ya sereke ew e ku ,serokatîya welêt ya nû xwest hêzên netewî yên Kurdî yên li dijî Baxdayê û Enqerê têxe bin berjewendiyên xwe. Wê bi serfirazî, ev karê xwe pêk anî , bi taybetî bi “partiya karkerên Kurdîstan re” ya ku li Turkiyê karê xwe dikir, ya ku serokatîya xwe bi giştî li Sûriyê bû û ya ku hema şerê hemo hêzên netewa Kurd li seranserî Kurdîstanê dikir. Şam wek Enqera û Teharn, wek her dem li dijî çareseriya pirs a Kurdî li Îrakê rawestiya . Wê jî, di hevdîtên Sûriyê yên siyasî û dîplomatîk bi Turkiyê û Îranê re, bi taybetî piştî serpêhatiyên li herêma kendavê baş diyar dikir. ((*dawî deqa wergerandî*)).

### **Têbîniyê wergêr**

**1- Ez dixwezim hin sirincan li vir bêjim, di serî de diyare ku nivîserên ku ev gotar li ser Kurdîstana Sûriyê nivîsandine, baş rewşa Kurdan ne dinasîn û agahdariyên wan gelek kevin û kêmin. êw baş di nivîsandina navên herêmên Kurdan de xuya dike. Çavkaniyên Kurdan tu carî navê herêma Cizîrê nakin “Elcezîra”**

û Çiyayê Kurdan, an jî Çayê Kurmênc. Nakin “Cebel El-ekrad” û Kobaniyê nakin “Eyn El-Ereb”. Her wiha, navên bajar û bajarokan, yên ku hatine Erebkirin bi kar nînin.

2- Diyare ku agahdariyên li ser Kurdistana Sûriyê, yên ku bi dest nivîserên gotarê de hene, ji erşivên siyaseta Sovyêtistana berê ne, ji ber ku mirov tu cara nikane dîroka beşekî Kurdistanê wisa bilez bide xuya kirin di pirtûkeke dîrokî de mîna “ dîroka Kurdistanê”, ji ber sê sedeman:

a- Pirtûk di sala 1999-an de hatiye nivîsandin, ango bi gelek salan piştî hilweşandina Sovyêtistanê. Di wan salan de, agahdariyên fireh û pir li ser rewş û pergala Kurdistana Sûriyê, çî ji aliyê siyasî, çandî, an jî ji aliyê aborî ve, di destê zanyaran de peyda dibûn.

b- Ew di bin çavdêriya zanyarên Kurdan de hatiye nivîsandin.

c- Ew dûrî kontirola saziyên dewletê hatiye nivîsandin.

3- Di dema îro de, pirê rewşenbîr û nivîserên Kurdan, nema gotina “Kurdên Sûriyê” di nivîserên xwe de bi kar tînin. Êdî ew gotinên mîna “Kurdistana Sûriyê” an jî Kurdistana Rojava, bi kar tînin.

## Ferhenga Înglîzî- Kurdî

Amadekarê vê ferhengê birêz Salah Saadallah ronakbîrekî Kurd ê Zaxoyî ye. Çapa yekem a *ferhenga Saadallah* di 1998 an de bi tîpên erebî li Baxdayê çap kiriye. Çapa duwem 2000 î, Istembul-Avesta . Wî bi xwe ferheng kiriye kurdî ya latînî.

Reşo Zîlanî û Kendal Nezan li rastnivîsîna metna wî nihrtine û bêyî ku dest bidin zaravayê amadekar, ji bo çêtir têgihîştina xwendevanên vê capê, hin peyvên teknîkî û zanistî li gor bilêvkirinê Kurdên Tirkiyê nivîsîne.

Di minhoya vê ferhengê de / 72000 / peyvên Înglîzî hene û bi zimanê kurdî hatî şirovekirin. Ji /1477 / rûpelan pêkhatiye

## Nivskar û xwendevan biramakên hev in

*Rozad Elî*

**NE VEŞARTIYE KU** li hemî welatan, yên ku ragihandin di destên wan de be, di hemî warên civat û dewletê de destladerên rastfinkî ne. Ji ber wê jî, gava rêjme ne demokrat tê ser textê destlatê, li destpêkê û daku kanibe raya giştî bi ramanên xwe dan bide û armancên xwe bê nakokî pêk wîne, hemî alavên ragihandinê dixwe destên xwe.

Li dewletên demokrat ên ku azadiya raman û ragihandinê diparêzin, ragihandin bi xurtî bi rola xwe ya normal radibe û ji ber girîngiya wê rolê, bi "desthelata çaran" tê bi navkirin. Ji xwe, di nav wan alavan de, weşanên xwendiniyê, wek rojname, kovar û entirnetê cihekî payebilind digrin.

Li Sûriyê, çap û weşanên bi ser arziyên dewletê ve tên jimartin, yên serbixwe jî, gereke di nav sînorên zagonên dewletê de bigerin û bixebitin. Ew zagon dîsa li gor nêrîn û helwestên rêjîmê hatine danîn.

Ji bilî wan zagonên fermî, yên yekalî û yekramanî, hinek taybetmendiyên me Kurdan jî hene. Em Kurd in, dewlet li me

mikur netê. Zimanê me, tîpên nivîsa me, çanda me qedexe ye, xem û pirsgirêkên civat û gelê me cuda ne, dibistanên me tune ne, em ji zaroktiya xwe ve bi Kurdî deng dikin, lê bi Erebî dixwînin û dinivîsin. Ev taybetmendî jî pirsgirêkeke ne hindik e, astengên zor giran datîne ser riya xwendevan, nivîskar, çap û weşanên bi zimanê Kurdî.

Bi tevahî, û daku çapemenî kanibe bi erkên xwe rabe, sê hîmên bingehîn jê re gerek in: Azadî, nivîskar û xwendevan. Gerek e hersê hîm bi hev re peyda bibin. Eger yek ji wan peyda nebe, çapemeniyî kulek dibe, karê wê lawaz dibe, dikeve kirîzê û nikane mîna tê xwastin erk û stubariyên xwe pêk bîne.

Em dixwazin li ser van mjaran bisekinin û nerîna xwe, bi kurtahî, bêjin.

### **1. Azadiya ragihandinê:**

Em dizanin ku li Sûriyê, alavên ragihandinê di destên dewletê de ne. Gelek tedbîr û zagon hene wê bend dikin, ji ber wê jî, ragihandin ne serbixwe û azad e. Gava alavên ragihandinê

jî ne azad bin, nerîn û raman tèn perçiqandin û rola nivîskar û ronakbîr lawaz dibe û namîne.

Ji bilî siyaseta hişk, ya ku dewlet li ser hemî alavên ragihandinê li Sûriyê dimeşîne, em rewşenbîr û konevan bi xwe jî pir caran rê li azadiya ramanê teng dikin.

Bi taybetî, alavên ragihandinê yên bi zimanê Kurdî, tenê çend kovar û belavok in. Yan partî derdixin, yan jî destê wan di paş de ye. Lewre jî, naveroka wan li gor helwestên partiyan tê. Ew jî nivîskar neçar dike ku ji xeta partî dernekeve û xwendevan jî neçar dibe tiştê ku heye bixwîne. Belkî sebebeke ew be ku gelek nivîskarên zimanê Kurdî berê xwe didin malperên entirnetê û berhemên xwe lê diweşînin.

## **2. Nivîskar:**

Roja îro, gelek merc û şert ji nivîskariyê re peyda bûne, ji ber ku, di dema me de, nivîskarî li gor babetan, şax şaxî bûye. Nivîsarên siyasat, wêje, çêrok, helbest, rexne, lêkolîn, zanist... û h.w.d. cuda tèn nasîn. Ji her yekê ji wan re jî amadekariyeke têvel gerek e. Ango, nivîskarî bûye pîşeyeke pisporane, gelek westan jê re gerek e.

Lê bi tevahî, em kanin pêdiviyên nivîskariyê wiha rêz bikin:

1. Behrek: Gelek nivîskar hene, xwedî xwendina bilind in, lê bê behrek in, ciwanî û şêrîniya nivîsandinê li ba wan peyda nabe. Gelek caran, dibe ku nivîskarekî xwendina bilind bi dest nexistibe, lê ew xwedî behrek e, kane ramanên xwe zelal û xweşik birjîne ser kaxezê.

2. Eger gola avê tijî nebe, di ser re narêje, nikane dora xwe avde. Nivîskar jî temam wilo ye. Eger tûrkê xwe bi zanîne danegire, nikane bikêrhatî bibe û jîr bimîne. Ew jî bi xwendina berdewam tê. Wê lomê, gerek e nivîskar ji xwendinê qut nebe û herdem bixwîne.

3. Di ber xwendina berdewam re, gerek e nivîskar herdem binivîse. Ji ber ku, ferhenga gotinan, bêjeya şêrîn, ramana zelal, stîla pak bi xwe netê, bi riya xwendin û nivîsandina berdewam diafire.

4. Ji nivîskar tê xwestin, zimanê ku pê dinivîse baş zanibe; rêziman, rênivîs, bêje û hemî taybetmendiyan wî têbigihê.

5. Her zimanek heyamek, sirûstek, rewşenbîriyek û kesayetiyeke wî heye û civakekê dinimîne, zor girîng e nivîskar wan taybetmendiyan nas bike.

Wek nimûne, nebaş e nivîskarê Kurd ustuyê zimanê xwe bade û bi Erebkî binivîse. Gerek dakeve nav gelê xwe, bi zimanê wî binivîse, ji ber ku ew ji mirovê Kurd ê ku niha li ser zemînê zindî ye re dinivîse û dixwaze ramanên xwe bigihîne wî, ne ji Horî û Mediyan re dinivîse.

6. Pêwîst e nivîskar bi derdora xwe hestewar be, bi jiyana mirov û komelgehê re têkildar be. Çinkî tiştê ji gel ve xuyan nabe, yan nikane şirove bike, ji nivîskar û rewşenbîr têxwastin ku wan şirove bike û nêrîn û helwestan jê re pêşniyaz bike. Nivîskarê ku ji xwe re dinivîse, li kêleka rêkê dimîne û zindî nabe.

### 3. Xwendevan:

Bi baweriya me be, xwendevanê zimanê Kurdî hîn peyda nebûye. Sedem jî gelek in; jê, dibistanên me yên Kurdî tune ne, mirovê Kurd, zaroyên me, ji biçûkaniya xwe de fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî nabin. Ê ku fêr bûye jî, bi mezinahî fêr bûye û ta çend hevokan ji serhev derdixe, toşî dijiwariyên rastînkî dibe.

Lê tiştê ku cihê mixabiniyê ye: Mirovê me, bi vê rewşa nezanî û cehaltiya bi zimanê xwe razî bûye û xwe spartiyê qelsiyê.

Eger ne wilo ye, çima hînî xwendin û çî nivîsandina bi zimanê xwe nabe?.

Ji wê bêtir, roja îro bi sedan malbatên Kurd hene dengkirina bi zimanê Kurdî ji bîr kirine, yan jî şerm dikin pê deng kin. Pirs ev e, çima coşa hezkirina zimanê Kurdî diçelmise? Zor pêwîst e ,em hemî bi hev re, li bersivê bigerin û çareyan jê re bibînin.

Berê me digot pirtûkên bi zimanê Kurdî peyda nabin, lê niha, rewş hatiye guhertin, gelek berhemên nivîskarên Kurd li pirtûxanan tên firotan, gelek kovar û belavok derdikevin û bi hesanî digihin destên xelkê, lê çima netên xwendin?. Ev qelsiya xwendevanan, dilsariyeke mezin di dilê nivîskar de çê dike. Gava nivîskar dinivîse û hestewar dibe ku berhemên wî netên xwendin, xemgîn dibe û coşa wî dişkê, hinek jî ji wan kurdî berdidin û li zimanê Erebkî vedigerin. Erê pir tiştên ku em dibêjin ji derveyî vîn û îrada me ne. Lê bêguman, gava em bixwazin, em ê kanibin gelek ji wan bi cih wînin.

Lê digel hemî tiştan, û li gor rewşên berê, em kanin bêjin ku, roja îro, rewşa xwendin û nivîsandina Kurdî ji berê rindtir e, û em bawerdar in ku rojên baş dê li pêş me bin.

## REWŞENBÎRÊ KURD Û PÊDIVIYAN

### Zamdarê zindî

**R**ewşenbîr ew kesê ku, parek baş ji zanîne wergirtiye . Lê, jê şaxekê kûr kûr dizane, gencîna xwe heroj ji zanîne tije dike. Ew jî dibe sedemek ku, berhemê bide û ramanên wî di komelgehê de ciyê xwe bigrin, bandorê lê bikin û çavkaniyên veguhêzê tê de vekin.

Dîroka berhemdayîna mêjiyê mirov daye nasîn, ku raman û şaristaniya berhest ya rûyalî (jiwarî), berî ya berdest (guhartinê civakî, mewdanî, konevanî...) bi demekê tê afirandin, rê jê re dûz dike û hawl dide. Weke ramana sermiyadariyê bi bergehê baş, li serdestê ramangîr û zaniyaran peyda bûye, mîna Cancak Roso , Foltêr, Molyêr, Montiskî ...H.W.D. Van di riya pirtûkên xwe re pirojeyên ristên bê û şeweyên wê çawa bin şirove dikirin; Ew jî bûn rêberîna şoreşa Firansî ya 1787 an, kevirê yekem ji şaristaniya sermiyandariya nûjen re ne. Nimûna duwem: Sen Sêmon, Hêgil, Karl Marks û hinên din. Ramana Sosyalistê

dora sed salî berî rista xwe peyda bû, baş baş ew rist şirove kirin.

Aya rewşenbîr stûnên bingehîn yê konê şaristaniyê û kevirê koşa avahiya wê ne,. Bi taybet ji netewên bindest û mêtîngêkirî re ,pêxemberê netewa ne. Lewra jî ,rola wan di pêvajoya wan netewan de zor pêwîst e.

Li gor nakokî û gelşên komelgê rewşenbîr dabeşî du biran bûne:

### A-Rewşenbîrên berdevkên serdestan:

**E**w li gor berjewediyên Êmperator, Şah, Xan , Xaqanan û serokên dîktator raman, bûyer û tiştan şirove dikin, da ku lingên wan serdestan di komelgehê de ciyê xwe bigrin û lengeran berdînin. Ji ber ku, parek ji pariyê berjewendê , di ber nava wan keve.Weha berdevkên wan bûn, bi navê wan şûr dikşandin û ji navên wan re distiran. Loma jî , helbestvan û pepûk di dîwanan de ji mirovên pût re pesin û lavij didan, navên wan cîlaw û şîrîn

dikirin. Rola wan, di avahiya ramanên şaritanîyê de ,lawaz û jar e.

## **B – Rewşenbîrên berdevkên bindestan:**

**E**v xwediyên wijdan, sinc û rewîştan e, zar û zimanê rastîyê ne. Hertim dijberiya şaşîyê , zor û zînatê dikin. Pakrewanên peyva rast in . Ji Suqrat , Sehir Werdî , Gelfîlo, Ibin El-muqefe' de têk ve, di girtin , kuştin û penaberkirina rewşebîran, bi destên van ristên toximperest û zînatkar tînin kirin bi der keve. Da ku, ji komelgehê bi dûr kevin û rîçalên xwe pê ve bernedin, ku di destên setemkaran de hilwere . Ev ton rewşenbîr kakilên komelgehê û şaritanîyê giyanwer in . Bi zimanekî din, ne peyayê serok û zordara ne, jîna xwe didin hemî tegaziyan (kuştin, girtin ...) ku rastî bi ser keve. Wek bi zimanê gelêrî tînin gotin (**peyayên şevên reş in**) di dîroka veguhêzê de rola wan ya sereke ye.

### **Rewşenbîrên Kurd**

**D**i ferhenga rewşenbîriyê de, mirovên kurd , yên ku parek baş ji rewşenbîriya kurd wergitine, xwedî hestên netewî ne, bi hest û nestên bilind xemxwar in û berketiyên netew û rewşenbîriya xwe ne. Ev jî di komelgeha kurdî

de .bela wela ne. Hin di hundirê bizava kurdî de ne , hin jî li derveyî wê ne. Asta wan , ya rewşenbîrî tînel e. Hin dî, di rewşenbîriyê de taybetmend in û hin jî na . Hin ji wan bi zimanê Erebbî dinivîsînin, tiştêkî ji aw û şeweyên nivîsandina bi zimanê kurdî pêş naxin. Hin jî bi zimanê kurdî dinivîsînin , di rewşenbîriya kurdî de dixebitin. Beşek ji wan bi çavekî erênî ,li bizava konevanî mêze dike, bi çavekî berpisyar lê dinêre û rexneyên rast û durist lê digire û dike.

Ji vî beşî, hin di nav partiyan de kar û barê rojane hildigirin û dikin. Kar dikin ku wan ji hundir ve biguhêrin. Gav bi gav , di kar û pirojeyên wan de beşdar in û bi çavekî erênî li rewşenbîrên derveyî bizavê dinêrin.

Beşê dudiyê, ew rewşenbîrên bi tu partiyan re kar nakin, sedemên wê karnekirinê jî gelek in . Belkî hin ji wan sedeman rast , hin jî ne rast bin . Beşek ji wan , carekê bi bizava konevanî qayil nabin . Ew bi şev û roj li kêmasî û tûkên bizavê digerin, da wan pê bikulîne. Dibe, hin ji wan rexnan, di ciyê xwe de bin. Lê belê , hilma tewşankiyê, ji hin rexnan tînin hildikele . Mirov hestewer dibe ku, hesta berpirsyariyê , ji van rexnan kêr

e. Ji ber ku, mixabin wan ta roja îro , tu çare ji pirsgirêkên bizavê re , ne jî tu alav ji wê yan li şûna rêbazên wê dîtine, tu gotin û pêşniyar nekirine .

Li vir, mirov dikane bipirse. Ma gelo?! Di nav kesên ku di bizava konevanî de kar dikin, rewşên tune ne?! . Ma mirovê konevan , çênabe rewşên be?! . Lê, kesên ku ji partiyên , bi dûr kevin û rexnan pir lê bikin û pê qayil nebin , ew rewşên in?! . Gerek e, mirov berçavkên reş , nexer çavên xwe. Çimkî , ew dê xwe di çewtiyan wer kin, wê pir nifşên pêşîn mîna berêz: Dr.Nuredîn Zaza, Cegerxwîn, Osman Sebrî û yên niha hê li ser kar in: Reşîd Hemo, Hemîd Hac Derwêş....H.W.D bêşînin..

Mirov dikane, careke din bipirse.Ger serokên tevgera kurd , li Sûriyê nezan bana?! . Wê çawa xwe ji astengên ku hatine ser gelê kurd bi derxistana?! . Bêguman, ev destkewtên ku îro, di destên mirovê kurd de ne ,dê li Sûriyê tunebana.

Weke mêjûya nakokî û guhartinê dibêje, di bin serê van herdu sedeman de pêşketin peyda dibe û dimeşe. Ji ber vê, komelgeha kurdî jî, li ser nakokî û gelşên hundir û dervayî ve pêvajoya guhartina xwe berdewam dike. Tiştêkî pir rast,

durust û normal e, ku di civata me kurdî de, beşek ji rewşên bîran hebe. Rexn û pêşniyaran, ji tevgera konevan re pêkêş û lê bike. Ji hêlek din ve, divê mirov dema dîrokî û rewşa netewa kurd tê re derbas dibe û tê de dijî baş binase, da ku serast çaran bibîne .

Di roja îro de, netwa kurd, bê dewlet e . Rewşa xwe , ne di destan de ye. Tu çîn serdest û bîndest ,di warê desthilatdariyê de tunene. Tu nakokî, bi xwînrîjandin û girtina zîndanê jî, tunene. Aya dewleta kurd tune, ta zorê li komelgehê bike . Di navbera wan de, dijberî peyda bibe û rewşên bîr dabeşî du paran bibin . Beşek yê desthilaltê û beşek jî ,yê gel be.

Vêca nakokiya sereke ya netewa kurd, bi dewletên ku rêç û şivêlên mafên wan girtine re ne. Bi desthilata Sûrî, Turk û Îranê re ne.Wan mafên gelê kurd daqiltandine.

Ji ber vê rweşê , tu nakokiyên tûj û germ ,di navbera bizava konevanî û rewşên bîrên kurd de, tunene. Divê komelgeha kurd, bi hemî kakil û herşên xwe, li ser xalekê raweste.

Em dîsa dipirsin, çi ji rewşên bîrên kurd tê xwestin?

1- Rewşên bîrên di partiyên de kar dikin ,xwe nexin qasnaqa



teng ya partîti û serokan. Bi zimanekî din, nebin rewşenbîrên partiyên xwe û hew.

2- Rewşenbîrên derveyî bizavê, xwe nexin dijberî û beramberiya wê, bi awakî serast nakokî û neyeksana nêrînan, di bin ala berjewediya gel de bajon serî . Ji ber vê, ticarî gelê kurd , bê rêxistin û partiyên, mafên xwe wernagire. Çi ev bin, çi bilî van bin.

3- Pir pêwîst e, li ku dibin bila bibin û ji kîjan partî dibin bila bin . Divê li hev kom bibin, ku dezgehekê ji xwe re çêbikin , da koşa wan bela wela nerin.

4- Li ser pirojeyên bizavê, ku ji bo mafên gelê kurd pêşkêş

kirine rawestin, nêrîn û pêşniyazên xwe bidin û bikin.? Pirojeyên ji bizava gel re nehatine pêşkêşkirin, wan jê pêşkêş kin, ku karibin bi zar-zimanekî di hemî waran de peyda bikin.

5- Li hember desthilat û tevgera Erebi ya dijberî desthilatê û yê di qasnaqa desthilatê de digerin, xwe nexin dijberiya bizava kurd. Divê miletê Kurd , bi heyînan xwe ( tevger, rewşenbîr û herşên din), bi derveyî xwe re, bi yek hêz û ziman be, gav bi gav li rex bizava kurdî be.

---

---

## JI PÊKENOKÊN RAST

Çençeliya gundek e ji herêma Efrînê, piyê Reco ye. kesekî vî gundî rojekê barekî xwe çêbû, dihere gundê Holîlê kerekî kirê dike, ku barê xwe lê barke . Ew barê xwe li kerê bar dike û bi lawê (kurê) xwe re dişîne, û ew yawaş ~ yawaş (hêdî- hêdî) bi rê de dimeşe .Di pê re gundiyekî wî ji paş ve digihêstê û misînekî baqîrî di destan de bû . Bi hal û xweşiya hev dipirsîn, xwediye bêr ji yê din re digot: Niha min bar li kerê barkir û bi lawê xwe re şand .

Xwediye misîn digot : Pê ! ez gihêştibamayê, minê misînê xwe bi ser bêr de lédaba.

Xwediye bar : Tu yî çawa misîn li kerê de û min ew kirê kiriye ?! Ez lê nadim...Yek livî yek li wî dev çedikirin hev .

Xwediye misîn, misînê xwe radikir û li serê xwediye bêr dixist û xwîn û xîrar bi ser de diherikand.


**Têbîn:** Bûyera ev çêrok, di ser pêncî salî re ye .

# Yilmaz Gûney

57 sal ji mirovatî û pêdariyê

K.Henan\*

**Y**ilmaz Gûney, di malbateke Kurd de dinya ronik dibîne. Ji destpêka jiyana xwe ve, bi ava qerma Torosê tê stiran, bi germahiya dešta Edenê tê hişkkirin û li ber lorîna sirgûniya Kurdan mezin dibe. Loma jî , germahiya mirovatiyê ,di dil de dikeli. Serbilindiya çiyayê Agrî, di eniya wî de bû .Dilovanî û mêrantiya Kurdan ,ji çavên wî dibarî. Belkî ji ber wê bû jî, ku nijadperestên Tirk xêr pê ne dikirin . Lîngekî wî, li nav gel û civakê bû , yê din di zîndanên kemalîstan de bû.



Y. Gûney, di sala 1937 an de ,ji dayîk bûye. Bavê wî Ehmed, Kurdekî Zaza bû, diya wî Gulê ji Mûşê bû. Wî di zarotiya xwe de, di ber xwendina xwe re, pir kar dikirin. Lê bavê wî dixwest, ew bixwîne. Y. Gûney, dibêje " Lê min tiştêkî din dixwest, min nizanîbû çî ye " .

Y. Gûney çêroka xwe ya yekê, di sala 1952 an de diweşîne . Di sal 1955 an de, nivîsarên xwe yê çapkirî, bi şewekî aşkere diweşîne. Ji ber wê jî, ji hêla desthilata Tirk ve, tê gunehkarkirin û heft sal û nîvan zîndan û sal û nîvek sirgunî didine . Dûre, ew ceza sivik dibe û sirgunî Qonyayê dibe.

Di sala 1958 an de, bi riya derhênerê sînemê yê Tirk, Atif Yilmaz ,di nivîsandina sînyaroya Filma wî, ya bi navê "Gurên vî welatî" de beşdar dibe . Dibe alîkarê derhêner û roleke lîstikvaniyê jî dibe. Ji ber wê, dîsa deriyê dadgehê lê vedibe û di sala 1959 an de, dadgeh cezayê didê .Lê ew xwe, ji ber dide alî û dev ji xwendina aboriyê , li zanîngeha Stembolê berdide. Di sala 1961 an de, 18 mehan, di girtîgehê de radikeve. Di wir de, romana xwe ya bi navê " Ew stûxwar mirin " dinivîse . Ew roman, di sala 1972 de, xelata Kemal Orhan werdigre.

Di sal 1963 an û di dezgeheke filman de dixebite. Di wê demê de, çend çêrok û sînyoyên filman dinivîse û di 5 salan de, di bêtirî 60 filmî de weke lîstikvan dixebite. Di sal 1968 an de, berpirsiyarê dezgehê, wî ji ber sedemên siyasî, ji kar derdixe.

Di sala 1972 an de, Y . G. ji ber piştgiriya hin xwendekarên şoreşger tê girtin. Piştî derketina wî ji zîndanê, bi çend heftan sala 1974 an, ew bi kuştina dadgevanekî suçdar dibe û 18 sal ceza didinê. Y. Gûney , di zîndanê de, sînyoyên çend filman dinivîse .

Y. G, ji ber pirtûka xwe ya bi navê " Li ser Faşîzmê " bi 7 sal û nîvan zindan û du sal û nîvan jî sirgunî tê cezakirin. Ji ber nameya wî, ya ji Fernando Herera re, berpirsiyarê mehrecana Valadolid (Espaniya) rê kirî re, pênc salan ceza dixwe

Piştî derbeya leşkerî ya 12 Êlûna 1980 li Tirkiyê, Y. Gûney ji Tirkiyê derdikeve û berê xwe dide Firansa , Ji ber wê jî, di 1981 an de, sazûmana leşkerî, wî ji welatiya Tirkiyê bêpar dike. Di sala 1982 an de, filma wî "Rê", di mehrecana navnetewî ya "Kan" de, xelata zêrîn distîne.

Li Firansa, di 24 ê Sibata 1983 an de, Y. Gûney û çend ronakbîr û rewşenbêrên Kurd, ji bo parastin û pêşvebirina çanda Kurdî, Enstîtuya Kurdî dadimezrînin.

Y. Gûney, di 9 ê Êlûna 1984 an de, li nexweşxanekê li Parîsê çavên xwe dadimrîne û dev ji dinya ronik berdide. Li 13ê Êlûnê, darebesta wî tînin Enstîtuyê û dora 2000 mirov, jê gelek berpirsyar, konevan, hunermend û rewşenbîr, di ber termê wî re derbas dibin û silava dawî lê dikin. Dû re, termê wî, di goristana mêrxasên Komona Parîsê de vedişêrin.

Helbestvanê gewre Cegerxwîn, vê namê ji enstîtuya Kurdî re, li Parîsê, dişîne:

(( Mirina dostê min ê hêja , Y. Gûney ,, dilê min perçe kir. Ez pir xemgîn im, dil bi kul im. Yelmaz stêrkeke geş bû di esmanê miletê Kurd de. Pir zû xuricî. Bi mirina wî dîwarek mezin ê seqafeta Kurdî hilweşiya. Feleka bê bext, dest neda ku ew merema xwe bibe serî. Fîlmên nû çêke, doza Kurdistanê bi cîhanê bide nasîn. Em çi bikin?. Hêvîdar im, ku ewê stêrkeke din, stêrkên din di esmanê me yê reş û tarî de peyda bibin. Dewsa wî bigirin....)).

## Birêzan,

Bi helkeftina roja rojnamegeriya kurdî , malpera rojava.net panoramakê derbarê rojnamegeriya kurdî li rojavayê Kurdistanê amade dike. Em van pirsan , ji we re dişînin, hêvîdar in ku ,di demek nêzîk de, bersivên we bighên me. Da em wan, di rojava.net de, biweşînin. Ya herî baştir ew e ku, hûn bi Kurdî bersivê bidin . Lê , eger hûn naçar bûn, hûn dikarin , bi Erebi jî bersivên xwe bidin.

Ligel rêz, silav û sipasiyan

**Ferhad Ehmê  
Rojava.net**

### PIRS:

- ji kerema xwe re , li ser tecrûbeyê weşandina kovara xwe ( ya ku we tê de kar kir û beşdarî di weşandina wê de kir) baxife:
  - kengî dest bi weşana wê bû, kê di birêvebiriya kovarê de kar dikir, çend hejmar jê derketin, mijarên serekî ên kovarê çi bûn, çend jimar ji kovarê dihatin belavkirin ( bi nêzîkayî), dijawriyên weşana kovarê çi bûn?
  - Di baweriyê we de , çi kovar û rojnameyên kurdî , li rojavayê Kurdistanê kê in û çima bêtir wan piştî çend hejmaran hew derdikevin? Çi gavên pêwîst hene, ku bête kirin da ku rojnamegeriya Kurdî , li vî perçeyî geş bibe?

### Bersiva kovara “Pirs”

**R**êzdar ... Berpirsên malpera Rojava.net.. Silav û rêz..

Ji Kovara ((Pirs)) ê ...

Li ser daxwaza we, em ê bêjin:

Navê kovara me ((pirs)) e. Pirs kovareke demsalî ye. Ji sala 1993 an de derdikeve. Lê mixabin, ew bi rêkûpêk netê

weşandin. Ji ber wê jî ,di 15 salan de 34 hejmar jê derketine. Ji her hejmarekê jî nêzîkî 1000 jimar çap bûye, lê yên rastînkî belav bûne ji wê kêmtir in.

Pirs kovareke rewşenbîrî ye; ji bilî siyasetê, her reng lêkolîn, gotar, hevpeyvîn, çêrok, helbest û ziman diweşîne.

*Pirs – hejmar -36 rûpel -----*

Ji ber ku li Sûriyê , ji çapkirina her tiştê re rêdana desthilatê gerek e û ji ber ku Pirs kovereke Kurdî ye, rêdana weşandina (çap û belavkirin) wê nîn e, ew qedexe ye û bi dijwarî roniye dibîne. Ji ber wê jî, navên kesên ku tê de kar dikirin weşartî mane û hîn jî wilo ye. Lê ya ku em dizanin, di salên nodî de, Dr. Ebdilmecîd Şêxo û Heyder Omer di desteya birêvebir de kar dikirin, ew herdu jî niha li Almaniya rûdinin.

Li ser pirsê ku, çima kovar û rojnameyên Kurdî, li Sûriyê hindik in û zû radiwestin, di baweriya me de, hinek sedem jê ev in:

- Nivîskarê zimanê Kurmancî û xwendevanên wî hindik in.

- Çap û belavkirin gelek zor e û zîndankirin pê ve heye. Ji hêla aborî ve jî gelek dijwarî hene, yê ku çap û belav dikin ziyana diravî jî dibînin û nikanin berdwam bikin.

- Sedema sîsiyê azadî ye.

Ji lewre jî, em bawer nakin ku rojnamegeriya Kurdî li Sûryayê dê bi pêş bikeve eger pirsgerêkên azadiya ragihandinê, peydabûna nivîskar û xwendevanên zimanê Kurdî li Sûriyê peyda nebin. Ew jî mîna

ku win dizanin bi rewşa Sûryayê ya siyasî ve girêdayî ye.

Pirseke û pêşniyazeke me heye;

- Win wek rewşenbîrên rojava li derveyî welêt, kanin çi alîkariyê ji hêla weşanê de bi me re bikin?

- Em pêşniyaz dikin, ku win pencerekê di malpera Rojava.netê de bi navê ((weşanên welêt)) vekin, tê de hemî weşanên rojnamevanî yê ku bi zimanê Kurdî derdikevin dînin. Em bawer in ku ewê pir sûdar be, û pere jî lê narin!!

**\* Li me bibor in..**

**Em ji we re spasdar in..**

**Ji ber desteya birêvebir ve**

**24.4.06**

**Dr.Rozad Elî.**

---

\* Em lêborînê ji xwendevanan dixwazin, wekî ku ev name pir dereng hat weşandin, lê me dît ku ewê zanişwereke bi sûd be.

## Nameyek ji kovara

### PIRS re....

Vê carê jî, wek carên berê, kovara PIRS ê “hejmara 26 an, havîna 2002 an” gihişte destên min, min naveroka wê bi germî xwend .Bi kurtî hejmareke, bi têxistiyên xwe, dewlemend bû. Lê, gotarekê ji wan hinekî ,li ba min bihtengî peyda kir.

Têxistiya ku ez ji hemiyar bihtir razî û ne razî kiribûm, gotara bi navê "Destpêka avakirina komele û bizavên rewşenbîriyê yên Kurdî li Sûriyê “Rûpelin winda”, ya bi xameya mamosta Dilawerê Zengî bû.

Gelo, razîbûn û ne razîbûn ji bo çi bû?

Bi rastî gotar, bi naverok û zimanê nivîsandina xwe, pir xweş û dewlemend bû. Lê, xwezî mafê ti kesî nehatiba windakirin û bihatana parastin. Gelo çima ?.

Hin têbîniyên giring, bi xwendina gotarê re , li ba min çê bûn. Wan ez ji bo nivîsandina vê nameyê, bivênevê kirim.

Nivîskar dibêje( rûpelê 4) :

*Ev gotar ya pêşî ye ko li ser wê qûnaxê tê nivîsîn. Min bixwe gelek dijwarî di nivîsîna vê gotarê de dît, ji ber ko tu kesî berî min li ser vê mijarê*

*nenivîsiye, û tu çavkanî û jêder li ber destê xwe min ne dît. Pîvî çend reşperek ji erşîva dîrokzanê navdar (Hesen Hişyar),- rehma xwedê lê be. Vêca, min hêz da xwe û li nav wan mirovên kalemêr û zana yê ko di wê demê de dijîyan, yan di wan komeleyan de pişikdarbûn geriyam û min gelek reşperek peyda kirin. Lê vê dawiyê pertûka mamoste Samiyê Ehmedê Namî bi dest min ket. Birastî min sûde jê wergirt û ez spasiya wî dikim karekî baş kirî ye.*

Vê dîtin û bizava xwe ( rûpel 4) berdewam dike, dibêje:

*Ev lêkolîn di sala 1999 an de hatiye vivîsandin. Li gorî wê demê tu pertûk an çavkanî li ber destan tunebûn. Lê di vê sala dawî de du pertûk hatin çapkirin. Yek jê bîranînên seydayê Cegerxwîn, û ya din pertûka Samiyê Ehmedê Namî bû. Kêm-zêde hinekî li ser vê dema ku em dipeyivin hatiye gotin. Lê dîsa jî ne bi firehiya ko min şirove kiriye û belgeyên dîrokî bi dest xwe xistine. Ev lêkolîn, bixwe çend rûpelin ji pertûka min a ne çapkirî ye.*

Di sala 1997 an de, mamoste Dilawer di gel biraderekî de hatin mala min li bajarê Qamişlo. Ev hevdîtîna bû hevnasîna pêşî di navbera me de. Piştî xwedanenasîn, bixêrhatin ( û li gor daxwaza wî), ez bi kurtî li ser damezirandina " Civata Yekîtiya Xortên Demokratên Kurd li Sûriyê " peyivîm /Ji ber ez yek ji damezrêneran bûm/.

Min ew hevpeyvîna ku li mala min hatî tûmarkirin, piştî demekê, di raxistina gotareke bi zimanê Erebi de û bi xameya mamoste Dilawerê Zengî, di bin sernavê " Sefehat mechûle min elnihûd elseqafî elkurdî fî Sûriya (dîrok) " de xwend. Belê , ev gotar di kovara Gulan El-Erebî de / hejmar 25,25 hezîran 1998an, hatibû weşandin.

Li vir, dixwazim bipirsim: Gelo, ew hevpeyvînên ku mamoste bi wan kalemêrên zana re kiribûn, yan ew gelek "reşperkên peyda kirî" / li gor gotina mamoste Dilawer / ne çavkanî û jêder in?! ku ew wan, di gotar û lêkolînên xwe de, weku çavkanî nabîne"?! Wilo jî cihê dalxê ye, ku nivîskar, bi xwe vê nivîsandina xwe geh bi navê "gotar" ê, geh jî, bi navê "lêkolîn" ê bi nav dîke!!.

Di bawerîya min de, dema nivîskarek çavkaniyan, di

nivîsandinên xwe de, bi kar bîne, ewqas ew nivîs xurt û dewlemend dibe. Wilo jî ew nivîs, li ba xwendevan dibe cihê bawerî û nirxandineke banbilind. Loma ez ne bawer im, ku nivîskarekî zana û têgihîştî, wek birêz Dilawerê Zengî, vî awayê bandora bikaranîna çavkaniyan nizanibe.

Lê, em ê xwe têxin wê baweriyê ku nizanibe jî ne kêmasî ye. Lêbelê, gava rola sipartin, berçavkirin û giringiya çavkaniyan zanibe, lê pêk neyîne, hinga ji nivîskar re wêranî ye.

Bi kurtî, mamoste Dilawer gelek gotar û lêkolîn nivîsandine. Wilo jî nivîsînên gelek nivîskaran dîtine û xwendine, lewra wî di gotara xwe de hin çavkanî, bi tîpên xwar, destnîşan kirine. Ango, pêdivî û giringiya destnîşankirina çavkaniyan dizane û dipelîne.

Ne kêmasî ye , gava mirov hin tiştan nizanibe û ji nezanî şaş bibe. Lê ku mirov ya rast zanibe û xwe li çewtiyê rast bike, da bi vê çewtiyê bibe mafxwerekî nezan, ew karekî ne durust e, û bîna xerabiyê ji wî karî difûre.

Ez xweş bawer im, ku nivîskarê me yê hêja, awayên bikaranîna çavkaniyan baş dizane, lê gelo çima ewqas

nimûneyên ku ji pirtûka seyda Cegerxwîn "Jînenîgariya min", wilo jî yên ji pirtûka Samiyê Mele Ehmedê Namî "Dîmenin ji dîroka wînda", birine û ew, di gotara xwe de, ne destnîşan, ne jî berçav kirine. Ne tenha wilo, lê ne wek pêdiviya ku çavkanî pê bê nivîsîn, di gotara xwe de berçav ne kirine!!.

Dilawer dibêje: "Ev lêkolîn di sala 1999 an de hatiye nivîsandin.....ev lêkolîn,bixwe çend rûpel in ji pirtûka min a ne çapkirî ye".

Ecayib!!!...Gelo, çawa ev lêkolîn di sala 1999 de ,di wê pirtûka ne çapkirî de, hatiye nivîsandin? û nimûneyên tê de hatî ji pirtûka seyda Cegerxwîn "Jînenîgariya min" in, /Ev pirtûk ji weşanên "Apec" ye,di sala 1995 an de, li Stokholmê, hatiye çapkirin/. Ne tenha wilo, lê 14 nimûne ji pirtûka Samiyê Mele Ehmedê Namî jî "Dîmenin ji dîroka wînda" bê destnîşankirin birine. /Ev pirtûk ji weşanên "Apec" ye, di sala 2000 î de, li Stokholmê hatiye çapkirin/. Belê, min hejmarek ji wê pirtûkê, di adara 2001 ê de diyarî mamoste Dilawer, li bajarê Şamê, kir. Lê, mixabin ku mamoste Dilawer ew nimûneyên ji pirtûkê girtî, wek nivîsa xwe, ne wek çavkanî bi kar anîne. Gelo çima?!! Ma karekî wisa, ji hêla lêkolînerekî

de, çi nirxî werdigre û çi giranbuhabûnê pêşkêş dike?!!... Ez nizanim!!!...Nizanim!!.

Mamoste Dilawer,di rûpelê 5 an de, ji wê lêkolînê dibêje:

" Lê vê dawiyê pertûka mamoste Samiyê Ehmedê Namî bi dest min ket. Bi rastî min sûde jê wergirt û ez spasiya wî dikim karekî baş kiri ye."

Ez , li vir, dixwazim bibêjim, eger nivîskar bixwesta ku nivîsandina wî ji rastiyê dûr neketa wî çaxî pêwîst bû navê pirtûka " Jînenîgariya min" ya seyda Cegerxwîn" û pirtûka " Dîmenin ji dîroka wînda " ya Samî Ehmed Namî, weku çavkaniyên gotarê bihata binavkirin û berçavkirin. Ji ber ku gotar di bingehe xwe de li ser naveroka van herdu pirtûkan hatiye avakirin. Lê, ew jî ne kiriye!!!.

Bi rastî mirov matmayî dimîne, gava dibîne ku ev gotar ( lêkolîn ) di sala 1999 an de hatiye nivîsîn, lê bi naveroka xwe ji nimûneyên ji pirtûka "Dîmenin ji dîroka wînda", ya ku sala 2000 an hatiye çapkirin mişt e. Gelo, rastî li kû dimîne? û rola çavkaniyan li ba mamoste Dilawer çi ye?. Bo ronîkirina van pirsan, ez ê çend têbîniyan berçav bikim:



1. Mamoste Dilawer hin guhertinên biçûk di jêderên lêkolîna xwe de kirine, da wan weku çavkanî bi nav neke. Bo wilo :

- a. Gotinek, yan çend gotin, li çavkaniyê kêr û zêde bûne.
- b. Şaşiyeke çapê di pirtûkê de hatiye /sala şewata sînema Amûdê 1927 bû / . Wî ev şaşî derbasî gotara xwe nekiriye, lê serast kiriye /ji ber rastiya bûyer sala 1937 an e/. Spas ku ev şaşî derbasî gotarê nekiriye.
- c. Navên welatparêz û siyasetvanên Kurd, yên ku min di pirtûkê de nivîsîne, wilo jî di gotarê de , bi wê terz û endazê , hatine raxistin. Lê, nabêje bê ev nav ji kû û çawa bi dest xistine.

2. Ez /Samiyê Mele Ehmedê Namî – danerê pirtûka "Dîmenin ji dîroka wînda"/ yek ji çar damezrênerên " Civata Yekîtiya Xortên Demokratên Kurd li Sûriyê " bûm. Ew civata ku di 21.04.1954 an de, li bajarê Qamişlo, hatibû damezrandin. Lê, min yek rojê nebihîstiye ku bernameya vê " Civat " ê li deverê hatiye

peyda kirin. Gelo, mamoste Dilawer ev bername ji kû bi dest xistiye, eger ne ji pirtûka min biribe?!.

Di vî warî de, ez dixwazim bibêjim, ku wê çaxî me yekemîn bernameya civatê bi zimanê Erebi danîbû. Belê, me arşivek ji civatê re durust kiribû û li mala kalemêrekî bi cih kiribû/ Kalemêr jî hevlekî civata me bû/. Ev erşiv, di sala 1960 î de, hate şewitandin. Sedema şewatê jî tîrsa ji Mebahis /hêza ewlekariya wê demê/ bû, ku destek û kargêrên Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê bi destên wê hatibûn girtin. Lê, tenha min hejmarek ji vê bernameyê di nav nivîsandinên bavê xwe , /Mele Ehmedê Namî/ de veşartibû. Min jî ev bername bi xwe re, sala 2000 î, derxiste Swêd û li wir, wergerande zimanê Kurdî û di pirtûka xwe "Dîmenin ji Dîroka wînda" de weşand.

Vêce, ez nizanim bê ev bernameya "Civat"ê çawa gihiştiye destên mamoste Dilawer? Çawa, di gotara wî de, weku kopiya pirtûka min, bê kêr û zêdebûn hatiye?. Çawa ceger dike ku bêje: *ev kar û xebata min e û ji ti pirtûk, yan çavkaniyan ne biriye?*. Wilo jî dibêje: *hêjayî gotinê ye, evê Civatê piştî damezrandina Partî*

( 1957 ) xwe hel kir.Lê, da ev war pir dirêj nebe, ez ê daneberheva gotara wî û pirtûka xwe bikim, da xwendevan bibîne, bê gotar çawa, ji naveroka pirtûkê, hatiye avakirin ,bê ku vê pirtûkê weku jêder berçav bike!! Tenha guhertinek biçûk di bernamê de kiriye, dema bendên nîzama Civatê kirine du beş / ji 1-4 û 1-13 /.

Gotar, rûpel 9 û 10:

*Di sala 1953 an de – Civata Yekîtiya xortên Demokrat ên Kurd li Sûriyê – hate damezirandin. Damezrênerên civatê: Mihemedê Mele Ehmed, Samî Mele Ehmedê Namî, Evdilezîzê Elî Evdê, Derwêşê Mele Silêman bûn.*

*Bernama Civatê:*

- 1- *Navê Civatê: Civata Yekîtiya xortên Demokrat ên Kurd li Sûriyê ye.*
- 2- *Civat, rêxistineke siyasî, çandî û civakî ye.*
- 3- *Komîteya navendî wê serkêşiya civatê bike.*
- 4- *Komîteya navendî ji çar hevalan pêk tê, ew jî ev in: Mihemedê Mele Ehmed, Samî Mele Ehmedê Namî, Evdilezîzê Elî Evdê, Derwêşê Mele Silêman.*

*Civat dê ji bo bicîanîn û bidestxistina:*

- 1- *Rizgarî û yekîtiya Kurd û Kurdistanê.*
- 2- *Xebat bê kirin ji bo pêkanîna demokrasîyê, da bibe sedemê bidestxistina mafên Kurdan yên neteweyî.*
- 3- *Xebat bû kirin ji bo rizgarkirina gelê Kurd, ji zulm û zora empiryalîzmê û kevneperestiyê.*
- 4- *Di dibistanên Kurdî de bikaranîna bernamê ji bo xwendina bi zimanê Kurdî û avakirina civatên Kurdî yên civakî, çandî, folklorî û komeleyên werziyê.*
- 5- *Berhevkirina berhemên destnivîs yên rewşenbîrên kurd û kultûra kurdî, da bikaribin di pêşerojê de çap bikin.*
- 6- *Weşandina rojnameke kurdî, bi tîpên latînî.*
- 7- *Piştgriya jina Kurd beramber nexweşiyên civakî û azadkirina wê ji wan nexweşiyên civakî û yên kewdeniyê.*
- 8- *Her kurdê ko bixwaze bibe endamê Civatê, diviyabû vê sûndê bixwe: " Ez bi Yezdanê pak û dilovan û şerefa xwe û şerefa*

*Kurdistanê sond dixwim ko bi dil û can bibim endamê Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd li Sûriyê û bendên destûra wê bê kêmayî bi cî bînim û jê re fidakar bim ta roja dawî "*

- 9- *Civat ji malikan tê ava kirin, her malikek ji sisê ta pênc endaman pêk tê, yek ji wan berpirsiyarê malikê ye û yek jê xiznedar e.*
- 10- *Malikên Civatê bi giştî xebata xwe di bin çavdêriya komîteya navendî ya Civatê de dikin.*
- 11- *Civînên malikan di heftiyê de carak e.*
- 12- *Her endamekî Civatê, di mehê de 25 qurûşên Sûrî mafê endametiya xwe dide xiznedar. Berpirsiyarê malikê wan pera bi rapora xwe ya mehane re, bo komîteya navendî bi rê dike.*
- 13- *Civînên komîteya navendî, Komîteya navendî di mehê de carekê civînekê li dar dixê, di civînê de raporên malikan tînin xwendin û belavok tê weşandin. Eger pêwîstiyek hebe ,dikare civînek din di nava mehê de li dar xîne.*

Di Pirtûka min de, rûpel 76 û 77:

Di 21.4.1954 an de, Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd li Sûriyê, li bajarê Qamişlo hat damezrandin.

Damezrênerên Civatê :

Mihemedê Mela Ehmed, Samî Mele Ehmed Namî, Evdilezîz Elî Evdê, Derwêş Mela Silêman bûn.

BERNAMEYA CIVATA  
YEKÎTIYA XORTÊN  
DEMOKRAT ÊN KURD LI  
SÛRIYÊ.

1- Navê Civatê: Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd li Sûriyê ye.

2- Civat, Rêxistineke siyasî, çandî û civakî ye.

3- Komîteya Navendî wê serkêşiya Civatê bikê.

4- Komîteya Navendî ji çar hevalan pêk tê, ew jî ev in: Mihemed Mela Ehmed, Samî Mela Ehmed Namî, Evdilezîz Elî Evdê û Derwêş mela Silêman.

Civat dê ji bo bicîanîn û bidestxistina:

5- Rizgarî û yekîtiya Kurd û Kurdistanê.

6- Xebat bê kirin ji bo pêkanîna demokrasiyê, da bibe sedemê bidestxistina mafên kurdan yên netewî.

7- Xebat bê kirin ji bo rizgarkirina gelê kurd, ji zulm û zora empiryalîzmê û kevneperestiyê.

8- Di dibistanên kurdî de bikaranîna nameyekê ji bo xwendina bi zimanê kurdî û avakirina civatên kurdî yên civakî, çandî, folklorî û komeleyên werzişiyê.

9- Berhevkirina berhemên destnivîs yên rewşenbîrên Kurd û kultûra Kurdî, da bikaribin di pêşerojê de çap bikin.

10- Weşandina rojnameke kurdî, bi tîpên latînî.

11- Piştgiriya jina kurd beramber nexweşiyên civakî û azadkirina wê ji wan nexweşiyên civakî û yên kewdeniyê.

12- Her kurdê ko bixwaze bibe endamê Civatê, diviyabû vê sûndê bixwe: " Ez bi Yezdanê pak û dilovan û bi şerefa xwe û şerefa Kurdistanê sûnd dixwim ko bi dil û can bibim endamê Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd li Sûriyê û bendên destûra wê bê kêmayî bi cî bînim û jê re fidakar bim ta roja dawî".

13- Civat ji malikan tê ava kirin, her malikek ji sisê ta pênc endaman pêk tê, yek ji wan

berpirsiyarê malikê ye û yek jê xiznedar e.

14- Malikên Civatê bi giştî xebata xwe di bin çavdêriya komîteya navendî ya Civatê de dikin.

15- Civînên malikan di heftiyê de carek e.

16- Her endamekî Civatê, di mehê de 25 qurûşên Sûrî mafê endametiya xwe dide xiznedar. Berpirsiyarê malikê wan pera bi rapora xwe ya mehane re, bo komîteya navendî bi rê dike.

17- Civînên komîteya navendî:

Komîteya navendî di mehê de carekê civînekê li dar dixê, di civînê de raporên malikan tên xwendin û belavokek tê weşandin. Eger pêwîstiyek hebe, dikare civîneke din di nava mehê de li dar xîne.

Gotar, rûpel 5:

*Di 5 ê çirya pêşîn sala 1927 an de civata Xoybûnê li Bihemdûnê - Libnanê hate damezrandin û di dîroka Kurdan de bû rêxistineke pir giring, karên pir mezin kirin, di warên siyasî û şiyariya millet de, û bi kar û barê şoreşeke nû li dijî Tirkên dagîrker, ji bo rizgariya Kurdistanê rabû. Li bajar û gundên Kurdan malikên Xoybûnê hatin avakirin.*

Di Pirtûka min “Dêmenin ji dîroka winda”, rûpel 33 de, ev deq bi xwe heye û rê. Dîlewer xistiye gotara xwe.

Gotar, rûpel 8:

*Di nîva salên sihî de, li bajarê Amûdê (Nadî Ciwan Kurd – Amûde)hate damezrandin. Serokê wê Mihemed Elî Şiwêş bû. Di vê nadiyê de, dibistana zimanê kurdî hate vekirin.*

Pirtûkê de, rûpel 63, ev deq wek di gotarê de hatiye, heye.

Gotar, rûpel 8:

*Di nadiyê de koma Rêçenasên kurd( koma keşafên kurd ) hate çêkirin.*

Pirtûkê, rûpel 63 de ev hevok bi xwe heye.

Gotar, rûpel 8:

*Rêçenasên Kurd di kolan û cadeyên bajarê Amûdê de, bi cilên xwe yî wekhev û li ser sînga her rêçenasekî ala rengîn, ala kesk û sor û zer çandî bû, û dibin siya alên kurdî yê ber bi ba dibûn dimeşyan û sirûdên kurdî digotin.*

Di Pirtûkê de, rûpel 64 de ev deq wek rêzdar Dîlewer aniye heye.

Gotar, rûpel 8:

*Ji xebata vê nadiyê :*

- *Alîkariya hin malên belengaz bi pere û xwarinê.*

- *Gerandin û belavkirina rojname û kovarên kurdî Hawar û pirtûkên kurdî.*

Pirtûk, rûpel 64:

Rêçenasên Ciwankurd gelek karên giring û hêja dikirin :

- *Alîkariya hin malên belengaz bi pere û xwarinê.*

- *Gerandin û belavkirina belavokên Civata Xoybûnê. ( Bi kurdî dihatin çapkirin).*

- *Firotna kovar û rojnamên kurdî, Hawar,Ronahî,Stêr û Roja Nû.*

Gotar, rûpel 8:

*Bi miletê kurd da zanîn ko bi zimanê kurdî jî dikarin zarokên xwe hînî xwendin û nivîsandinê bikin.*

Pirtûk, rûpel 64/ Min ev gotinên jêr, yê nîşankirî, ji pirtûka seyda Cegerxwîn ( Jînenîgariya min, rûp 230) girtine. Lê mamoste Dilawer, bê ku çavkaniyê destnîşan bike, di gotar xwe de daxistine. Belê, seyda Cegerxwîn wisa dibêje:

“Kar û ziyana me ji vê Nadiyê çî bû ? Kara me ew bû ko me bi miletê kurd da zanîn ko bi zimanê kurdî jî dikarin zarokên xwe hînî xwendinê bikin”.

Gotar, rûpel 8:

*Di sala 1937 an de Civata Azadî û Yekîtiya Kurdan hate damezrandin, serokê civatê Dr.Ehmed Nafis bû û sekreterê serok seydayê Cegerxwîn û berpirsiyarê sindoqa pera Arif Ebas bû, û endamên berpirsiyar, Celadet Bedirxan, Haco axa, Ebdirehmanê Eliyê Yûnis, Qedrî Cemîl paşa, Ekrem Cemîl paşa, mela Eliyê Topiz, Mele Ehmedê Namî, Evdê Têlo û Mihemed Elî Şêxmûs ( Şiwêş ).*

Di Pirtûka min, rûpel 55 de ev deq bi xwe heye.

Di dawiya vê sergêjekê de, ez dixwazim bibêjim, ku ez nirxgiraniyeke mezin didim kesatiya mamoste Dilawer. Wilo jî didim kar û xebata wî, di warê toreya Kurdî de. Ez serkeftinê ji wî re, wilo jî ji kovara "PIRS" ê re dixwazim.

Ez ji hemî nivîskarên Kurd hêvî dikim, ku sînga wan ji rexnê re fereh be û destnîşankirina çavkaniyan, ji xwe re, kêmasî nebînin. Wilo jî ez bi hêvî me, ku mamoste Dilawer vê rexneya min bi dilferehî qebûl bike.

**Samî Ehmedê Namî**

**Stokholm**

Takê vehesê:

Berê çol fereh bûn, rê tunebûn, xelkê rêwîngî bi dewêr dikir. Li deştê jî zad diçandin, bi rojan pale dikirin. Gava dixwestin vehesin ,xwe davêtin siya darekê. Li deşt û çolan jî, pir dar tunebûn, yek dar ji ber birînê diflitîn û li deştê diman. Di germê de, ew dar pir bi qîmet dibûn, siha wê dibû cihê vehesê, dibû "takê vehesê". Ev gotin bi demê re ji başî, qencî û camêriyê re bû nimûne. Gava mirovek baş be, camêr be, mirov kaqne li ba wî vedihese, jê re dibêjin ((Bûye takê Vehesê)). m.e.

**Pirs..**

Çend perçe helbestên biçûk, ji berêzan: Dilbend Xelîl – Amûdê, Azad menan- Aleman, Mistefa Henan –Efrîn, ji me re hatin. Em wan sipas dikin. Hêvîdar in , ew di hejmareke din de werine weşandin . Em li benda berhemên we yên ciwantir in.

## Navên çend çiyayên Kurdistana Bakur

- 1- **Menzûr** : Çiyake ji çiyayên Dêrsimê ye. Bi 3450 m, ji riwê deryayê bilind e.
  - 2- **Xidir** : Ji çiyayên Dêrsimê ye, 3250 m bilind e.
  - 3- **Tûçik** : Ji çiyayên Dêrsimê ye, 2500 m bilind e.
  - 4- **Çil** : Ji çiyayên Dêrsimê ye. Jê re "çil çiya" tê gotin. Bi 2000 m bilind e.
  - 5- **Kurê misto** : Ji çiyayên Dêrsimê ye. Bi 1500 V.
  - 6- **Alagos** : 4100m bilind e.
  - 7- **Ararat** : 6 kîlometran m bilind e. Jê re "Agirî" dibêjin .
  - 8- **Gurgur** : 3000 m bilind e.
  - 9- **Mircan** : Bilindbûna wî dora 3000 m . e
  - 10- **Hoste** : Bilindbûna wî ne kêmî 3000 m bilind e.
  - 11- **Zil** : Bi qasî 2500 m bilind e.
  - 12- **Dûzgun** : 2500 m bilind e.
  - 13- **Sipê** : 3000 m bilind e .
  - 14- **Nemrûd** : 3050 m bilind e .
  - 15- **Qendîl** : 3250 m bilind e .
  - 16- **Horîkan** : 3150 m bilind e .
  - 17- **Nal pat** : Bi 2930 m bilind e.
  - 18- **Şerefdîn** : 2500 m bilind e.
  - 19- **Guman kaşan**: 2850 m bilind e.
  - 20- **Şêtan** : 2500 m bilind e .
  - 21- **Kevirçîn** : Çiyak ji çiyayên Kurdistana bakur e . Bi 3200 endaze ji riwê Derya bilind e.
  - 22- **Mujged** : Çiyak ji çiyayên Kurdistana bakur e . Bi 3300 endaze ji riwê Derya bilind e .
  - 23- **Xurlîk** : Ji çiyayên Kurdistana bakur e.
  - 24- **Gumgum** : Ji çiyayên Kurdistana bakur e.
  - 25- **Tendûrek** : 3200 m bilind e .
  - 26- **Tewar** : 3000 m bilind e.
  - 27- **Bilgîş** : Dora 2000 m bilind e.
  - 28- **Çol** : 2107 m bilind e.
  - 29- **Molpat** : 3600 m bilind e.
  - 30- **Rîza** : 2750 m bilind e .
  - 31- **Tosîk** : 2650 m bilind e.
  - 32- **Kêmsûr** : Ji çiyayên Kurdistana bakur e.
  - 33- **Qop** : Ji çiyayên Kurdistana bakur e.
  - 34- **Ziyaret** : 2700 m bilind e.
  - 35- **Qasim** : Çiyak ji çiyayên Kurdistana bakur e.
- Hêjaye em bêjin ku, **çiyayên Hemrîn , Toros , Zagros û Dêrsim**: Ev her çar zincîr, ji zincîrên Çiyayên Kurdistanê ne.

**Danehev : Dilbend Xelîl**

Ji Dîwana ( Melle Ehmedê Palo ):  
"Dewr û Gera Kurdistanê"

# Qelewbûn

Dr.M.Elî

**Di** serdema me de, qelewbûn bûye pirsgirêkeke tendurustî giring e. Xem û pirsgirêkên tendurustî, ji milyonên mirovan re çê dike û dibe sedema gelek nexweşiyên ku mirin jê peyda dibe, ji bilî ku sergêjiyeke civakî û jiyanyerî ji mirov re çê dike.

Li destpêkê û ji bo ku, em zanibin mirovek qelew e yan na, baştir e, em "Nisba Girseya(kitle,mass) Govde" NGG bipîvin. Ew bi vê şêweyê, tê pîvan: Giraniya govde bi(kg)/dirêjahiya mirov bi (m). Yanê wek nimûne, gava giraniya mirov 100kg be, dirêjiya wî jî, 1.80m bin,  $1.80 \times 1.80 = 3.24m^2$ ,  $100/3.24 = 30,8$  ev NGG wî mirovî ye.

Li gor encama vê zagonê ( $kg/m^2$ ), pileyên qelewbûnê li encama NGG wiha tên danîn:

- Kêmtirî 20an be, jar e.
- 20 ta 25, normal e.
- 25-30, giranî bilind e.
- 30-40, qelew e.



- Bêtirî 40 qelewbûneke jandar e.

Qelewbûn û zêdebûna giraniyê, ne tenê bi rewşa tamarî (wîrasî) ve girêdayî ye, ew bi peydabûna xwarina xweş, rûniştina dirêj û liva hindik ve jî têkildar e. Zarokê ku dê û bavên wî qelew bin, %80 derfet heye ku ew jî qelew be.

**hikariyên qelewbûnê li ser tendurustiyê:**

## - Qelewbûna jandar:

Gava nisba NGG dibe bêtirî Çelî. Wê hîngê metirsiyên îjdl, li ser tendurustiyê peyda dibin, wek: Mirina ji nişkave, pêhnçikandina di xewê de, bêhnkişandina ne baş, xulmaşî herdem, pîrbûna xulekên sor di xwînê de û pirsgirêkên wê, westandina dil, westana



gurçikan, bilindbûna tansyona xwînê, liva mirov hindik dibe ew jî wî ji kar dike... Ji bilî wan, mirovê qelew, çi ji hêla civakê û çi ji hêla karûbar û jiyana xwe ya kesane ve, gelek astengan di jiyana xwe de dibîne.

### - Qelewbûna orte:

Yanê NGG ji 30 ta 40 ye. Xedariya qelewbûna ort e, li ba mirovên temenên wan di bin 45 saliyê re, bilintir e. Lê hatiye nasîn, ku xedariya wê li ba mirovên temen mezintir hindiktir e. Ji ber ku diyar bûye ew bi nexwaşîne din dimrin. Lê belê, nexweşiyên tekûz bûne ku, ji qelewbûnê peyda dibin, ev in: Tansyona xwînê, şekir, bilindbûna qatiqê xwînê, kevirên ziravê û pençejana malçûk li ba jinan.

### **Dermankirina qelewbûnê:**


Ji çareserkirina qelewbûnê, ev şêwe bikar tên:

- Birîna hinavê (me'de): Ew birînkari hinavê biçûk dike, mirov di salekê de ji sedî çil ra pêncî ji giraniya xwe datîne. Ew birînkari bêtir li ba mirovê zêde giran û dermanên din lê hikariyê naikin bikar tê. Ev şêwe niha pir bikar nayê.

- **Qelewbûna orte û giran:** Parêziya xwarina kêr wize(taqa), dimîne şeweya sereke di daxistina giraniyê de. Birinc, dondirme, şêrînayê û qatiq xwarinên herî giring in ku bo zêdebûna giraniyê. Lew re, zor pêwîst e, ku ji xwarinê werin birrîn, Lê gereke werziş jî, were kirin. Birrîna xwarinê ya xort, yan rojiya giran, kane pirsgirêkên tendurustî yê xedar peyda bike, nemaze ji aliyê dil ve. Ji lewre gereke neyê kirin.

- Gelek derman hene, di warê jarkirinê de tên xebitandin, ji ber ku gelek ji wan ziyandar in, û jêvebûn ji wan dijwar dibe divê ew bi şewra diktoran bikar werin.

Wek serencam, qelewbûn ji du tiştan peyda dibe, tamar(wîrasê) û vîn(Îrad e). Wê lomê jî, ew li vîna(Îrada) mirov dimîne û li dawiyê her kesek dibe bijîşkê xwe.



## **Windowsa Kurdî êcar ne xew ne..!**

**L**i gora vê projeyê, dê navend û "instîtuyên zanîn û teknolociyê" IT ya peywendîkirinê ji aliyê hukûmeta Kurdistanê ve, bi alîkarîya kompanyaya Microsoftê bên damezrandin.

Bi mebesta ku hukûmeta Kurdistanê, giringiyeka bêtir bide geşkirina Kurdistanê, bi amadebûna Azad Geylanî şêwirdarê serokwezîran ê ji bo karên teknolojî û peywendîyan, rêkevtinek bi kompanyaya navdar a Microsoftê re hat imzakirin.

Li gora vê projeyê, dê IT ya peywendîkirinê ji aliyê hukûmeta Kurdistanê ve, bi alîkarîya kompanyaya Microsoftê bên damezrandin. Ev proje, giringiyê jî dide bilindkirina astê, siyanên kadirên hukûmetê û dê zanînen teknolocî di dezgehên hukûmeta Kurdistanê de û li zanko , instît û pişkên nemazeyî bi kar bên.

Vê kompanyayê erkê çêkirina Windowsa kurdî jî daye ser milê xwe. Ew jî ji bo ku wezaret û dezgehên hukûmeta herêmê , di warê duristkirina Softwora

zimanê kurdî de , sûdê bibînin. Herweha, dê portalek , li ser malperê bê vekirin, ji bo ku sûd ji akademîstên Kurd jî bê dîtin û komkirina zanînen data jî pêk tîne.

Ev proje , di warê pêşxistina sistema teknolocî û şîretkariyê de, alîkariya hukûmeta Kurdistanê dike, da ku bigihêje astê welatên cîhanê yên pêşkevî. Li gora projeya ku hatiye imzakirin, kompanyaya Microsoftê û wezaretê kar û barên civakî ya Kurdistanê, dê xol û korsên fêrkin û hînkirina computerê ji xwendevanan re vekin.

Herweha jî, bi çendan kompanyayên navdar, ên cîhanê wek.. Oracle, Sun Microsystem, Cisco û Intel amadebûna xwe , ji bo geşkirina Kurdistanê nîşan dane. Ev yek jî, dê bandoreke siyasî û stratecîk ,li ser paşeroja Kurdistanê çêbike.

**Çavkanî :** netkurd.com

Bê rastkirin /ji enternetê ye/

# JI GULISTANA RAMANAN

*Merwan Berekat*



**Bê** guman mûmek  
nikane tariya sevê di xwe

de wenda bike....  
û ne jî kane cihê rojê bigre , ,  
yanjî xwe wekî heyvê bibîne  
lê ji bo ronahiyê her û her xwe  
dike can gor  
û qozîkên tarî bi ronahiya xwe  
ges dike .  
ji ber mûm dijî tariyê ye pir  
pend û sûret ji bo wê hatine  
gotin ,  
pend û sûreta kurdî dibê :  
( Mirovê xwedî raman mûma di  
tariyê de ye )  
belê raste hisê ji ramana rast û  
durot hatibe avdan her û her  
gese ,  
ew wekî rojê ye mij û moranê Ji  
hev bela wela dike ,  
û rastiya her tîstekî dide xûyan  
kirin .  
pend û sûretekê kurdî ya din  
heye ew jî pir tê ye gotin ew jî  
eve :  
( Gulek biharê naxemlîne )  
lê divê mirov ji bîr neke ku  
carna gulek kane pir xemlan  
bike ....  
yanê wek tê nasîn diyariya  
guleka sor ew nameya dilan û  
dil ketinê ye  
ew gesbûna bihara evîndariya

du kesane ...  
yek gul kane bîna xwe bide  
civatekê  
û ber eniya bûkekê Ji  
bixemlîne....  
belê carna gulek dibe bihara pir  
pinpinîkan .  
ew e ya rast ku mirov wek gulê  
be ,  
û bîna xwe ya xwes di xwe de  
venesê re  
divê her mûma wî vêketî be û  
bîna ramanên rast û durost jê  
bê,  
ji berê de hatiye gotin :  
( Eger tu bixwazî ji bo salekê  
biçînî, divê tu genim biçînî ,  
û eger tu bixwazî ji bo deh salan  
biçînî, divê tu darekê biçînî ,  
lê eger tu bixwazî Ji bo sed salan  
biçînî, divê tu ciwanan biçînî )  
wekî tê nasîn jiyan bê hêvî nabe  
,  
lê ji bo hêvî di qasnaqa pûçbûnê  
de tevzand nemînîn ,  
siv û liv ... kar û xebat ji bo wan  
gerek e .  
Jiyana bê raman ne jiyane ,  
û ramana ku nekeve xizmeta  
mirov û mirovatiyê  
ew ne ramane ....  
divê mirov rastiye di serê xwe  
de kufkî neke,  
ya rast ewe ku ew xwe bike wek

mûma vêketî ,  
 ew wek gula bi bîn be  
 û ji bo çandiniya sed salan re li  
 kar be  
 û her bihara jiyanê bixemlîne .  
 Gulistana ramanan pir zengîne  
 gulên wê reng û rengin ,  
 de ka em di wê gulistanê de  
 bigerin û gulên wê bileqînin  
 bila bîna wan ya xweş derkeve  
 derveyî sînorê gulistanê  
 û ya baştirîn ewe ku her kurdek  
 çî xwendevan be , nivîskar be ,  
 rewsenbîr be , karker û cotkar  
 be  
 bila gulekê Ji van gulan di  
 gulistana hisê xwe de biçîne  
 û bîna wê li dor hawîra xwe  
 belv bik e  
 û ber eniya her zarokekî ...her  
 ciwnekî .... û her pîr û kalekî ....  
 her keç û xortekî pê bixemlî ne  
 .  
 elê ey kurdê hêja :  
 divê her yek ji me gulekê Ji  
 gulên bîn xweş di gulistana  
 netewa  
 xwe de biçîne  
 raste gulistana netewa me  
 zengîne û her xemlandiye  
 lê bi gerekî parastinê ye .  
 divê em ji welatê xwe hez bikin  
 û her xizmet karê gel û welatê  
 xwe bin  
 parastina sedemên hebûna me ,  
 ew ji bingehên ramanên rast û  
 durustin ,  
 ew bingeha weltparêziyê ye ya  
 hebûna netewa me ye .

divê em bi zimanê xwe yê zik  
 mak bigrîn û bikenin ,  
 ta êş û birînên xwe bi kurdî  
 bikewînin .  
 divê em bi kurdî bixwînin .....  
 binivîsin .....  
 û di mala xwe de bi zarokên  
 xwe re bi kurdî bipeyivin  
 û wan hînî xwendin û  
 nivîsandina zimanê kurdî bikin  
 em kanibin bila ew bi listokên  
 kurdî bileyzin .  
 wê cihê pesin û pesnedariyê be  
 eger mirovek di jiyana xwe de  
 çend kesan fêrî xwendina û  
 nivîsandina zimanê kurdî bike .  
 bila mirov ji bîr neke ku ziman  
 nasname ye û mirovê bê  
 nasname be ,  
 ew wenda ye  
 belê ziman diyari ya xwedê ye ,  
 divê her yek qasî kanibe  
 diyariya xwedê biparêze  
 eger gencek bi zimanê kurdî ji  
 yara xwe re bibêje :  
 ez ji te hezdikim wek hezkirin a  
 Memê Alan ji Zînê re ,  
 yan jî keçek ji xortekî re bibêje  
 ez ji te hez dikim  
 wek hezkirina Sêrînê ji Ferhad  
 re  
 ew ji xunceyeke ji gulistana  
 ramanên rast û duroste.  
 bê guman eger gundek li ser  
 gorên goristanê gund bi kurdî  
 binivîsin ....  
 û xoceyek di mizgefta xwe de ,  
 sîretan bi zimanê kurdî li gelê  
 nimêjvanan bike

û bi kurdi li ber xwedê yê xwe  
 bigere  
 ez bawrim xwedê jî wê ji wî û  
 nimêjvanan razî bib e .  
 eger rewsenbîrên kurd pênûsên  
 xwe di xizmeta gel û welatê xwe  
 de ziwa bikin , û  
 ew xwe nekin qasnaqa ezîtiyê ,  
 ewê bibin robarek ji çemê  
 ramanên rast  
 ne serme , ne kimasi ye û ne jî  
 ne basiye  
 dema rewsenbîr xwe bi zimanê  
 xwe mijûl bike  
 û nameya xwe ya rewsenbîrî bi  
 zimaê xwe yê zik mak bi dawî  
 bike .  
 eger mirov pakrewanên azadiyê  
 li bîra xwe bîne .....  
 û deqakê bê deng ji bo canê wan  
 bisekine  
 yan jî gurzek gul li ser gora  
 pakrewanekî bê nav dîne  
 û fathekê Ji bo canê wî bixwîne  
 ew jî ji ramana raste .  
 Eger helbestvanek helbestekê Ji  
 bo azadiyê birise .....  
 û dîroknivîsek bûyerên gelê xwe  
 di rûpelên dîrokê de rast  
 binivîsîne .....  
 û stranbêjek straneke filoklorî di  
 dilankê de bistirê  
 û çend kes jî li wî guhdar bibin  
 ew jî ji ramanên durostin .  
 eger mirov astîxwaz be , hevlê  
 dadîmendiyê be , pêstgirê maf û  
 rastiye be  
 û hevalê hevalê xwe be .....

û di civaka xwe de bi karê bas  
 hatibe naskirin  
 ev jî guleka pir bîn xwese û ji  
 gulistana ramanên raste.  
 eger pîre jinek yan jî kalemêrek  
 di nav sê çar zarokan de rûne  
 û çêrokekê ji çêrokên kurdan ji  
 wan re bibêje ...  
 eger havek yan jî dêyek zarokê  
 xwe di hempêza xwe de  
 bilîskîne û henekan bi wî re bike  
 û bibêje :.....  
 korê min  
 lawê min  
 cegera min  
 û straneka zarokan bi zimanê  
 xwe jê re bistirê.  
 ev jî yeke ji bingehên ramanên  
 rastin  
 bê guman kurdê xwediyê ev  
 ramanin  
 ku me anîne ziman tevayî be ,  
 divê nav li wî be ( pêxemberê  
 ramanê ) ,  
 yan jî ( Dilê di sîgê rastiye de ) .  
 ey kurdên hêja û pir giran bûha  
 ey xwendevanên delal û rêzdar  
 li dawiyê ez ev gotina xwe ya  
 jêrîn diyarî her kurdekî dikim  
 ( Bi dil nepîve .his zêr dipîve ) .



# STIRANBÊJÊ KURD Û ZIMAN

## Pertewê Şerqî

**Z**iman pênasîna mirov e, nasnama gela ye, her weha stûnê netewî yê bingehîn ye.

Di dîrokê de, setem û zordariyê, gelê Kurd perîşan kiriye û hertim zimanê wî ji aliyê desthilatan ve qedexa bû ye. Ji ber wê jî, em dibînin bandora zimanên Turkî, Farisî û Erebî lê hebû û heye.

Li hember vê rewşa zimanê Kurdî, folklor û wêjeya Kurdî, bi şeweyên xwe yên têvel, lenger di holê de kûr berdane û heyîna Kurd û şaristaniya wî parastine.

Di vê çarçewê de, dixwazim hinekî li ser rola stiranbêjan, di warê bikaranîna zimên de baxivim.

Di baweriya min de, stiranbêjiyê, ji lorandina dayîkê ve destpêkiriye, Li dûvre, bi boneya her serpêhatî, destan û babetekê stiran û stiranbêj hatine hole. Yanê, zimanê devkî, ji mirovên stanbêj ve, li dar ketiye û berdewam e.

Di vî warî de, ezê hinek ji stiranbêj û stiranên folklorî yên Kurdî destnîşan bikim.

**Stiran:** MEM Û ZÎN,  
SIYAMEND Û XECÊ,

DEWRÊŞÊ EVDÎ, EYŞA ÎBÊ,  
CEBELÎ, ŞÊX SEÎD Û H.W. D.

**Stiranbêj :** MERYEM XAN,  
MIHEMED ARIF, HESEN  
CEZRAWÎ, KAWÛS AXA,  
GULBIHAR, TEHSÎN TAHA,  
CEMÎL HORO, EYŞEŞAN,  
BAQÎ XIDIR, ELÎ TICO Û H.  
W. D

Van stiranbêjan, li gora derfetên demên xwe, stiranên ceng û evîndariyê, yên xweş dilorandin û di warê parastina folklor û zimanê Kurdî de, roleke zor bilind lîstine.

Li dû wan, stiranbêjên mîna (MIHEMED ŞÊXO, ŞIVAN PERWER, CIWAN HACO Û GULISTANÊ), bi dengên xwe yên xweş pileya hestên netewî, li ba gelê Kurd, gelekî xort kirine û mala xwe ava kirine.

Lê mixabin, hinek ji stiranbêjên me, gava dixwazin ji folklor bistirên, carna -bi zanebûn yan bi nezanî- stiran û gotinê vedibêrin û bê berpirsiyarî distirên.

Di vir de, dixwazim hinek nimûne, ji wan stiranbêj û stiranên berçav bikim.

**-Nimûne"1":** Stiranbêjên mîna: Ciwan Haco, Seîd Gabarî

û Husên Omerî, stirana folklorî ya binavê "Kalo" distirên û weha dibêjin : Kalo kalo Kûçik lawê kûçik, Kurê Keçkê bi çûçik.:

- **Nimûne"2"**:Stiranbêjek, di telefizyona ROJ û MMC de derdikeve, ew jî weha distirê :

Lê şimik zerê

Lê ker bavê

- **Nimûne"3"**: Elî Aştî , ji Efrînê ye, stiranên Şivan Perwer distirê, yek ji wan stiranan (lo me çi kir, me çikir) e. Şivan perwer weha dibêje "li paytextê Enqerê xwe nekin kolên berê". Lê Elî Aştî tîpekê ji peyveke wê stiranê dughêre (belkî bi nezanî be jî) û dibêje: "li paytextê Enqerê xwe nekin kerên berê".

Gelo! Ma çêdibe , em folklorî Kurdî weha, bi cîhanê bidin nasîn. Û çêdibe, em gotinên wilo nexweş û ne durist bikar wînin?. Erê belkî hin, ji wan stiranên kevin û ji folklor bin,. Lê belê, her tiştek jê netê gotin û li dema niha netê. Emê wan tiştan tomar kin, hilînin, lê pêdvî nake ku em hemî tiştî bêjin û zewqa guhdaran pê bêşînin.

Divê stiranbêjên me, haya xwe ji wan ton karên weha hebin û bi berpirsiyarî zimanê dayîkê û hunera me pêş ve bibin.

*Pênc Roviye*

Çûçik û Pilingek

Çêrokek Rûsî , Werger ji Erebi:

**Mistefa Henan**

**D**ibêjin, roviyek û jina xwe , li Rojhilatî Bakistanê dijiyan, pênc zarokên wan ên biçûk hebûn. Her roj, wan xema xwarina xwe dixwar. Loma jî, her ku roj diçû ava û şev dadihat, wan xwe berdida çarşiya bajêr , li xwarina xwe û zarokan digeriyan. Carina nanê hişk, carina jî bermayiyên xwarina çêkirî,carina jî rastî perçeyên goşt, yan jî hinek masî

dihatin. Bi vî awayî, jiyana xwe berdewam dikirin.

Şevêkê ji şevan , ew ji awa xwe vedigerîn mal. Bi rê ve, rastî pilingekî dihatin, ku li nêçîra xwe digeriya û awa xwe dikir. Çav li wan ket , gilêz bi dêv ket. Berî wê, rovi tim henekên xwe bi jina xwe dikir, digot: Jinikê ka bêje min: Çiqas aqlê te heye? Jinika reben û stuxwar li wî vedigerand, digot : Aqlê min qasî qufek hejîr heye.

Jina wî jî , ji wî pirs dikir: Ka tu bêje çiqas aqlê te heye? Rovî bi pozekî bilind digot: Aqlê min qasî tijeyî heft tûrkan heye, heft Qantir divên ku wî hilgirin. Lê gava piling rastî wan hat xûya kir aqlê kê ji yê din kêmtir e.

Dema ku rovî çav li Piling ket, ziman di dev de ziwa bû, çok lê sist bûn û lerizîn, nizanî dê çawa xwe ji vê astengê derxîne .

Jina wî jêhatî bû, ne wek ku wî didît bû, dilê wê neçel bû, gote Piling : Apê Piling ,seydayê min, baş e ku tu rastî me hatî, ji ber ku em nema li hev dikin, hema hema em dê hevdu berdin. Lê , em li hev netên, ji ber ku pênc zarokên me hene, em nizanin çawa wan parvekin, ez dibêjim : Sisê yên min û didu yên te, ji ber ku min pir cefa, di ber wan de dîtîye û karê malê jî her dem yê min e. Ew jî dibêje: Na.. Hersê zarokên nêr yên min in û dudiyê mê yê te ne.

Seydayê min, ka were me , du li hev wîne, para me her yekî ji hevdu biderxîne û xêr û xweşiyê tu bibînî.

Dema ku piling , ev gotin bihîst û navê her pênc zarokan ,li guhê wî ket, çav lê sor bûn û gilêz bi dêv ket, di dilê xwe de got: Ezê wan û her pênc zarokên wan bixum, loma wî got:

"Ez nikarim we li hev bînim û ti biryaran bistînim, ta ku ez her pênc zarokên we ne bînim û nas bikim ewê bi kê re bimînin".

Jina rovî, bi pêlanên wî agahdar bû ku ,piling dixwaze wan û zarokên wan jî bixwe. Lê wê jê re

erê kir. Çav di serê rovî de beq bûn û şêr û mêt ma, nizanî jina wî çî pêlanan digerîne.

Jina Rovî ji Piling re got: Em ê , li pêş herin û tu jî li paş me were mal, da ku tu wan bi çavên xwe bibînî. Bi vî awayî dan dû hevdu, bi rê kektin û berê xwe dan mala Rovî.

Dema ku gihîştin ber devê qulê, jinikê got : Apê Piling, tu nikanî, derbasî hundirê qulê bî, ji ber ku devê wê pir teng e,çêtir e ku em zarokên xwe derxin, da ku tu wan bi çavên xwe bibînî.

Piling ji wan re got erê. Jina rovî çav li mêrê xwe kir ku, ew jî bide dû wê. Bi vî rengî, ew derbasî hundir qulê bûn û bi zarokên xwe re kirin kurtepişt ku dengê xwe nekin û ji qulê dernekevin, ji ber ku Piling li derveyî qulê li benda wan e, eger ew derkvin , ewê wan tevan bixwe. Rovî hemî, di qulê de diman û nema derdiketin, heya ku buvehî ji ser wan diçe.Pir dem di ser Piling re derbas bûn, ew li benda ku rovî ji qulê werin der û wan bixwe.

Roj hilat, dîsa rovî û çêlikên xwe derneketin. Piling bê aram û hosan bû, wî hêviya xwe birî û pir poşman vegeriya û çû nav daristanê li nêçîrek din geriya.

Ji wê rojê ve, nema rovî, bi jina xwe re digot : Ka çiqas aqlê te heye. Lê gava jina wî , ji wî dipirsî û digot: Ka çiqas aqlê te heye.

Hema wî, bi dengê nîzîm û melûl digot : Aqlê min qasî.. qasî... Hejîran.. yek bi çûk heye.



## Xewsê welêt

" Dayika min, boz venegeriyabû malê"

Paul Celan

Şêxê min î xews venegeriya malê  
kete nav cerg û dilê Kurdistanê



Tengezarê Marîni

Henaseke sor li wê deverê.  
Ba dadikeve ser laşê te,  
trajîdiya bêdawiya lehengekî  
cîhanî ye.  
Pencera heyhayê ye, mêbûna  
xwe diparêze.  
Şaneşîna te mîna şîna min e.  
Tiliyên te rêkên jinavbirinê bûn  
Lêvên te bi meya Cizîrî li işqa  
demê bûn.  
Tu,..  
Aşiqekî, dîroka welat di xwe de  
vedîşêrî  
Li destpêkê min vegeirîne  
Va ye laşê min,  
Çîrokên te berbi destpêkê ve  
tîne.  
Gundê te bendewarê te ye,  
Piştî rê dipêxîne.  
Gazindan dîkin, te xatir nexwest.  
Strana xewê dibêjim  
Hev ragirtin hewes û henasên  
min  
Ji dûriya te tirsîyan.  
Li pirsên xwe dizîvirin mirîdên te  
Rêça min dest pêkir  
Ez li paş xwe dimînim.  
Şev çavê şevçiraxê ye.  
Tu dengê ba yî

Şev hat û ez  
birim.

Şev  
Mirin û ez  
li spêdeyê nûgihayî,  
ji zû ve zîz in.

Kê got:

- serê xwe di ber vî welatî  
de ne êşîne!?

Tariyek min radestî ya din dike.  
Mîna te dengê bêhêvî me,  
di nêv payîzan de, diçim û tîm.  
Bi hilma xwe şevê jî pirsên  
mirinê kêmdikim.  
Asoyên êşa te dipîvim,  
xewna min derdorên xwe bi  
valahiyeke reş xemilandin.  
Tariya bêrîkirinê, gora jiyana  
min.

Dibarin..

Di şîne de xak noq dibe û  
şîn bilind dibe.

Bi hijmêre bi tiblên xwe..

Goristanan

Dojehan

Stêrk û generalan

Şikestinên wan bihejmêre

Bihijmêre şêxê min

Girtîgehan

Şaneşînan  
 Dîroknivîsên sexte  
 Çavtirsanderan bihijmêre  
 Genosîd û kuştaran bihijmêre.  
 Mêvan î  
 Mazulvan î  
 Balinde yî  
 Sirûdên we, izên te dinoşim.  
 Ayatên mûyên te dixwînim.  
 Dema li ser şaxên dilê min  
 niştecih dibî,  
 balindeyî nemêvan î.  
 Şax welat e  
 Welatekî rût te bişkivand  
 Xewnê te.. ..?  
 Rehên dema min ya çûyî  
 hingivtin peyvên te.  
 Li welatê berf û sermayê  
 Welatê karîna peyvgotinê  
 pênc kêlikên te,  
 lavija dilê me biland û tewand  
 xewsê kesk.  
 Te agir û xewna min velorandin.  
 Şev bû,  
 min hêviyên xwe spartin ocaxa  
 te.  
 Gavên te kompiyoterê êşê ne,  
 Zivistanên min li hev dipêçin.  
 We'zên te  
 windahiya nebûnê bûn.  
 Li Şama xwîn û birînê  
 Ya kerb û kînê  
 Ya şampiyona rev sernixwînê,  
 têkçûnên xwe berbi te dirêjkin..  
 Na..na..  
 Agirê jiyanê pêxist çûna te.  
 Pir ewr hene  
 Ewrekî reş melûl e  
 Dengê wî tê

Pirs – hejmar -36 rûpel -----

Ji dûr  
 Ji nêzîk  
 Ji bînahiya xakê  
 Ji bin çengê şevê  
 Derveyî te  
 Tirs ji şaşiyên xwedê azad dibû  
 Li hiyola xwe vedigeriyayî  
 Min tirsaxwe diteptipand.  
 Di kûrahiya çavên te de,  
 bermayên roniyê hebûn.  
 Te destê xwe di ser serê wan re  
 dibir.  
 Ev xak bi çiyayên te hatiye  
 stirihandin,  
 di ber me re diçe  
 Melûl e melûlLLLLLLLLLLLLLLLL  
 - Sultanê marîfet û  
 bêdengiya te..  
 Tiliya li ser birîna min e, dengê  
 te.  
 Dêw bûn,  
 dêwên ji le'netê.  
 Bêken  
 Bêmey  
 ji tariya te vêketim ez.  
 Derya pêlan himbêz dike  
 Xwîn mehrecana xwe hêdî hêdî  
 lidar dixê  
 Dereng e,  
 dûr e laşê min  
 şev e, tu kesk dihêyî.  
 xewsê welêt:  
 - bendewarê mirina metirsiyanê  
 me

**Ciwanê Abdal**

Pir tişt têne ber çav,  
Xweş dibînim  
Roj û sal û dîwar  
Û dibin penaber.  
Pir tişt têne ber guh weş,  
Xweş dibihîzim  
Deng û awaz û pergal  
Û dibin koçer

<sup>ii</sup>  
**Ji goraniyên Fersî**

**Azadiya min**

**George Moustakî**

**Wengerandin: Anahîta Hemo**

Azadiya min ,ji mêj min tu  
parastî. Mîna xişlek bê hempa  
Azadiya min  
Tu bû yako bi min re alîkarbû ,  
Di ferawaniya keştiyan de  
Da herin her deverê  
Da em herin ta pêşî jî  
Rêçên saman û pît  
Bo em bicivin bi tema  
Gulek ji bê  
Li ser tîrêjek ji heyvê  
Azadiya min ,Li pêşiya vînen te  
Giyane min dabûn  
Azadiya min  
Min hemû dabû te  
Gumlêkê min yê dawî  
Çendî jan kêşandin  
Da karibin te razîbikin  
Min welat guhertin  
Min heval windakirin

Pir tişt têne ber bal  
Tên û diçin kaş û newal  
Jibîr nabin, vedigerin dîgar  
Û dibin keser.  
Lê pîrsa bê pîrs  
Çi jê ma li cem te nîgaş,  
Ji ber wêna te winda bû  
Ji ber navê te ber ba bû  
Ji bilî sozê evîna te  
ma sozeke deyndar  
Pir dîtin..pir jibîrkirin  
Lê kî tenê ma pûtê hişiya

Da bextewer û rûsipîbim bi  
baweriya te  
-Azadiya min te zanîbû ji min  
derîne  
Hemû alaxên min  
Azadiya min  
Te hişt ez hezbikim  
Ji tenhabûnê jî  
Te hişt ez bigirîjim  
Dema min didît bi domahî dibe  
-Lendek cîhangîrî  
Te ya ko min parast  
Dema min xwe vedişart  
Da birînen xwe dermanbikim  
Azadiya min û xesma min oxir ji  
te xwestiye ,  
Şevê ber Çile, Mîran,  
Min dev ji gogêşî berda  
Ew yê ku pêkve dibûrandin  
Dema ko bê metirsî  
Pêyan û pendê bi hêz girêdayî  
Min ew hişt çêbike  
Û min xinizî bi te re kir  
Bo zindana evîne  
Û Lewenda û rûşêrîna  
, bendîwane .

# Ji kûpê Kurd

## ( Genhkarî )

Mihemed mexot sala 1924 an li bajarokê Selemiyê, ji dayîk bû .  
Hê bi çûk bû dest bi nivîsandina helbestê kir. Wî bi dirêjiya / 72  
/salan gelek xelat wergirtin, ji wan ya -Iwês - û Îstîhqaq sala  
2002 an . Berhemên wî wergerî pir zimanan bûn . Dora ~ 20 –  
nivîsî bû, ji wa : Li ber ronahiya heyvê (helbeste) – Oda bi  
milyonan dîwar – Kesek ye weten(şanoye) ~ çêroka şevê miselsel  
Tilvizyoniye – Sînor (Filim) Sînemayiye û gelek gotar û dawiyê  
Goçerê Sor ( bedewî El-ehmer) van du helbestan ji wê pirtûkê  
hafî wergerandin . ev helbestê yekê bi du navnîşana ye.

Li wir dengêkî ketî  
Weke yê keşta fetsî  
An avjeniyê dike  
Her tiştê jê hez dikim û  
dafêrim  
Dengkirinê qaling dike  
Di helbestê  
Şanoyê  
Azadiyê  
Û biharê de  
Di niştîman û penaberiyê de  
Ne Hêştirek û mê Hêştir û  
beybûnek min  
Têde heye  
\*\*\*\*\*  
Ey kulîkên henarên dûr  
Ey hêlanên zarotiyê  
Min ji vê rewşê bi derxînin

Di jiyana xwe de  
Min sonimek ne diziye  
Gêrak ne pelixandî  
Cînarek ne êşandî  
Qelsî di pêdiviyên xwe de ne  
kirî  
sûndik ne xwerî  
Dengkirina kesî ne biriye  
Bi ser wê de  
Di her bûyerê de  
Hê gunehkarê yekê me  
Pêjina  
Pê zarokên xewnakin û nan  
naxin  
Ditirsînin

**Mihemed Mexot**  
**Wergêr: Mhemed Qere Hesên**

# Zengilê Har

Her hêvarekê  
teze teze  
li çavên te  
digerim  
bi her dîtinek  
ji wan re  
sed piyalên  
îmbîta mize  
dinoşim  
Sewda te  
zengilekî har e  
di guhên min de  
ranakeve  
gava te barkirî  
ax....  
ez çi bêjim  
Hezar helbestî min  
bi hev re  
ca  
n  
da

Oflaz  
8. 1994

## TA KÎNGÊ

### Remzî mela Marif

Demeke pir tê xeyalim, bi belav difikirim  
Demeke lale zimanê dilê pir azarim  
Demeke baysî pastime, îzetê nefesim  
Demeke mane; y berzîme, bextê bedkarim  
Demeke şewqê li asone daye roja ûmûd  
Demeke subehî mrem min ne dîtiye, şecgarim  
Li dewra nuqtaya navên dayraxemêda  
Li ser sehîfaya vê dewrê mina p;ergarim  
Şev stêrmêriyê dikim, heta dibe roj  
Bi roj heta dibe şev pasvanê bazarim  
Ji ded û daxê carna til dixum, û hişyarim  
Ji of û axîne carna axê duxim û hişyarim  
Bi sure cewrcefa sîng birînim  
Bi tîra ded û bela cerg û dil birîndarim  
Feleka min çep lêda, bê nave, dibê çi bikim  
Di gel zemanê bedkar û bextê bedsarim  
Ne xudanê pez û dewar, cot û amelim  
Ne suhibê revoke, garan, gund û zevî û zarim  
Ne şêxê dest birî, aynê dîne, bi dinya bê darim  
Ne bîr û murşîde bê çav rûyê riyakarim  
Ne xudanê kes û karekî dewlemendê bi cengim  
Ne suhibê kur û kalekî zor destdarim  
Ne şareza bi belat û ne hev demê sofera  
Ne yawerê wezîr û emir û xunkarim  
Ne katibekî dîni, xudpesendê nefsmim  
Ne şayrekî hawa berzî herze gotarim  
Ne ji wê mumweze be şermokêd bed exlaq  
Ne ji wê mudeqê bed navêd bê a;rim  
Ez ew biçûkim, ku ji fezlê xwe heta nika  
Bedî min nekiriye deheq beyar û exyar  
Min ew wezîfe perest nika bîst û sê sale  
Li ser wezîfê ez ne kirme zecir û înzar  
Demeke çimkî bi mêzîna ihtram û qar  
Mucewheratî sdaqet firoş û kiryarim  
Demeke, çimkî li bazarê eyfet û e;daye


## **Binefşên Tariyê**

Binefşên tariyê, destaneke (roman) bi zimanê Kurdî, bi destê nivîskarê hêja Zeynel Abidin hatiye nivîsandin. Durvê destinê, ji /176/ rûpelên orte pêkhatiye û di sala 1999 an cara yekê, li bajarê Iştembûlê çap bûye û ji van beşan ava bûye:

- A- Evîn rûmeta êşên me ye
- B- Hêvî her tim ne hosta ne
- C- Tavên êşê
- D- Binefşên tariyê
- I- Hevpariya evînê
- F- Rûbara vejîyana me
- K- Li ber xwe bide kerba min a birîndar.

Roman, di minhoya xwe ya ramanî de, gelek li pêş e.

Hezkirina du kesan, di hinava hezkirina mezin ya welêt û millet de mizin dibû .Di warê nivîsandin û riste



nivîsê de, ev roman ligel bêjeyên erebî, yên pir tê de bi karhatibûn mîna ava zelal, xwêner bi hesanî wê xweş dixwîne . Çi û çawa dibe bila bibe, bêguman yê cihekî naskirî , di avahiya wêjeya gelê yê Kurd e werbigire.

**Pirs**

### **Dumahîk:Rûpela ( 48 )**

Piştî azadbûna beşê başûr , herçû ev daxwaz û hêviya jor bi hêztir û bilintir bû .

Lê mixabin biryara perlemanê Kurdistanê başûr ji bo bikaranîna alfabeya erebî wek alfabeyeke fermî di hemî dezgehên hikomet û civaka

xwe de , ew hêvî qelskirin û bêhêvîtiyek peydakir .

Vêca hêvî û daxwaza me ewe ku, lêvegerînek li wê biryarê ji aliyê perlemanê ve bi pişikdariya hin kesên pispore di zimên de bê kirin û bi kêmanî alfabeya Latînî ( alfabeya Celadet , Nûredîn û piraniya gelê Kurd ) netê qedexekirin û li kêlek ya Erebi bi kar were .

### ***-Bijî gelê Kurd û Kurdistan***

#### **-Her bijî zimanê Kurdî**

- Munteda Nuredîn Zaza ya çanda Kurdî li Sûriyê
- Rojnama NEWROZ ya bi zimanê Kurdî li Sûriyê
- Rojnama DENG ya bi zimanê Kurdî li Sûriyê
- Kovara PIRS ya bi zimanê Kurdî li Sûriyê
- Saziya mamoste û fêrkerên zimanê dê li Sûriyê

*Pirs – hejmar -36 rûpel -----*

## BANGA HÊVÎTIYÊ

- 
- Rêz û silav ji Parlemana Kurdistanê re ....
- Rêz û silav ji Hikometa Kurdistanê re .....
- Rêz û silav ji kak Mesûd Berzanî serokê navçeya Kurdistanê re

### Celadet Bedirxan dibêje :

#### **“ Yekîtiya gel bi yekîtiya zimên e,yekîtiya zimên jî bi yekîtiya tîpan e “**

Li ber ronîya gotina jorîn em dixwazin nêrînek zimanewî ku, bi ziman û gelê me gerek bidin xuyanîkirin .

Weke em dizanin , bêparbûna netewa Kurd ji sedan salan ve , ji avakirina dewletek yekbûyî , bû sersedema diyarbûna gelek zarav , tore û alfabeyan di zimanê Kurdî de . Ev pîrbûna zaravan bi xwe jî di roja îro de , sermiyanekî başe ji pêşketin , vejîn û dewlemendkirina zimanê me re .

Ji zaravên Kurdî hin hene yên peyvandin û azafînê ne , mîna Kurmanckî , Dumilî , Zazakî , Hewram , Gorî û Lorî . Ev zarav kevinin û di dîrokê de tamar berdane . Vêca bikaranîna wan pêwîste , ji bo geşkirina zimên .

Lê , li kêlekê di cîhana tore û rojnamegeriyê de , herdu zarav Soranî û Kurmancî bi kar tên û li çar perçe Kurdistanê têne têgîştin .

- Li aliyekî dî , berê nivîsandina Kurdî bi sê alfabeyan bi kar dihat ( Latînî – Erebi – Kirlî ) , ta ku , Kurdên Sovyêta berê dev ji alfabeya

kirlî berdan û li şûnê alfebeya Latînî bi kar anîn û kend û girêk li pêş yekbûna zimên kêmkirin .

Em dizanin ku , bikaranîna alfabeya Erebi , li başûr û rojhilatî Kurdistanê ye . Û alfabeya Latînî jî li bakur û başûrî rojavayî Kurdistanê , Ewropa û li Sovyêta berê bi kar tê.

Ji berê paşê vê , zimanzan û zimanhezên Kurd yên mîna Nûredîn Zaza daxwaza yekîtiya bikaranîna alfabeyekê dikirin .Ji ber ku , yekîtiya zimên di wê de didîtin û herweha yekîtiya gelê Kurd jî xurt dibû . Lê, berê piraniya wan ji ber van sedeman ber ve alfabeya Latînî ya Celadet Bedirxwan bû .

1-Alfabeya tewrî di cîhanê de bi kar tê, alfebeya Latînî ye .

2-Alfabeya Latînî , Alfabeya Kompîyoter û entirnêtê ye jî .

3-Fonatîka devkî ya zimanê Kurdî bêtir bi riya alfabeya Latînî zelaltir dibe û cî têde digire .

4-Piraniya xelkê me yê Kurd , ta hin girok ji Kurdên başûr jî vê daxwazê dikin .

5-Ji paşeroja gel û zimanê Kurdî re jî weha baştîre , ji ber ku , bi wê ziman û gel wê were parastin û li gor demê be

**Dumahîk: Rûpel (47)**